

ARMANC  
Ji mehê  
carekê  
dertê  
Hejmar: 114  
Adar  
1991  
Buha: 15 Skr.  
3 DM

# Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC  
Monthly  
Kurdish  
Magazine  
No: 114  
March  
1991  
Price: 15 Skr.  
3 DM

Li Kurdistana Başûr rûpelek nuh vedibe

## Kurdistana ber bi rizgarbûnê ve



Berpirsiyarê PDK'a- Iraqê li  
Ewrûpayê Hîşyar Zêbarî

-Welle heta nuha em tu carî hewqasî nêzî şikandina Seddam nebûne. Berî nuha gelek kesî digot ku muxalefet tune ye, muxalefeta Kurdî miriye, Seddam wê her bimîne. Lê ev rapêrîna li Kurdistanê û li xwarî Iraqê îspat kir ku opozîsyon ne li derva ye, di nav mîlet de ye. Hoşyar Zibarî di Konferansa Stockholmê de ji muxabîrê Armancê re rewşa Kurdistanê ya îro bi van gotinên jorîn dianî zimên.

Ji Silêmaniyê bigre heta Dihokê Kurdistan gav bi gav ji îşxala hêzên dijmin têt rizgarkirin û hêzên pêşmergan kontrola hemû bajarên mezin, wek Silêmaniyê, Kerkûkê, Mûsilê, Xaneqînê û Dihokê digre destên xwe . Li gor beyanên berpirsiyarên Cepha Kurdistanê, temamiya Kurdistanê rizgar bûye.

rûpel 11

Konferansa Stockholmê daxwaz dike:

## "Mafê tayinkirina qedera gelê Kurd qebûl bikin !"

◆◆ Zordariya li ser ji 20 milyonî zêdetir Kurdan êdî divê ji alî civaka cihanî neyê qebûl kirin. Ew tehdîdek e li ser aşî û îstikrara Rojhilata Navîn û tecawuza li ser standartên mafên mirovayî ye ku bi peymanên navnetewî hatine tespît kirin.

rûpel 8

Daxwiyaniya  
Konferansê û  
dîtinên beşdaran  
li ser Konferansê

rûpel 6-7



Thomas Hammarberg yek ji însiyatîfgerê konferansê bû (Foto: Armanc)



Karin Söder û Dr. Mahmûd Osman her di dîwanê de bûn

(Foto: Armanc)



## Hêvî li ser me Kurdan e

Di dîroka gelê Kurd de rûpelekî nuh vebû, qonaxek nuh destpê dike. Lê rojên destpêkê yê ve qonaxê rojîni herî krîtîk in. Buyerên ku bi şerê Xelîcî dest pêkirin li herêma Rojhilata Navîn û bi taybetî li ser axa Kurdistanê dibin sedemê guhertinê bi lez û bez. Rojek ne wek roja berê, heta seetek ne wek ya berê ye. Buyer wek pêlên deryayê li pey hev tên û vedikişin, bi xwe re pêlên hêvî û endîşeyên dilê her Kurdekî hildikin û dadixin.

Di şerê Xelîcê de, ordiya Seddam, wek keriyê ku gur di nav keve, belawela bû, çek û cebirxanên xwe li cî hişt, ji 1/5'ê erdê Iraqê jî di nav lepê mutefîkên di serkêşiya Amerîka de hişt û baz da. Bi deh hezaran kuştî, birîndar û êsîr li pey xwe hişt. Vê rev û şikestinê rê li ber serîhildanê gelê Ereb û Kurd vekir, li Basra, Kerbela û Necefê Erebên Şîî li tevayiya Kurdistanê jî Kurdan bi gelêrî serî hildan, dezgehên dewleta xwînrij hilweşandin û li seranserê Kurdistanê idare xistin destê xwe. Seddam ordiya mayî pêşî şand ser Erebên Şîî, serîhildana wan bi xwînê şikand, nuha jî berê xwe daye Kurdistanê bi tank û top û teyarên şer, bajarên Kurdan bombaran dike, xelkê sivil, jin û zarokan bi hovîti qetîl dike. Li Başûrê Iraqê hîn serîhildan dom dike, geh radibe pêdarê û geh vedikişe. Li Kurdistanê hemû Kurdan çek hilgirtine bi şîarên "yan Kurdistan, yan neman" hicûmî ser ordiya Seddam dikin. Her rojê agirê serîhildanê li derekê pêdikeve, her rojê xebera qetliama gund an bajarekî ji alî ordiyê ve bela dibe.

Dinya bêdeng temaşê dike, Amerîka wek gihîştibe armanca xwe, kela dilê xwe daxistibe bi xemsaftî temaşeyî ve êrîş û serîhildanê dike. Li ber çavên wan teyare û helîkopter bombên napalmî û çekên kimyayî li ser bajarên Kurdistanê dibarînin, her çî ev li dijî peymanî agirbestê ne jî Amerîka pêçika xwe nalivîne. Sovyet, qetliam û diktatoriya jî bo wê ne tu tişt in ew li Konseya Ewlekarî ya Netewên Yekbûyî li ser navê diktatoriya Seddam di guftûgoyan de ye, dixwaze û mihawe dike ku barê teslîmiyeta Seddam sivik bike û makîna wî ya şer xelas bike.

Dewletên serkeftî, siyaseta xwe bi eşkeretî zelal nakin, di binî re jî kes nizane di nav çî pîlan û dolaban de ne. Çaralî Kurdan dijmin in; Tirk, Fars û Ereb wê çibikin ne xwiya ye. Lê her tişt jî wan tê payîn.

Loma jî buyer wek dewkilekê pêşde û paşde liba dibin. Pê re, gav pêlên hêviyê, gav jî yê tirs û erdîşan asîmanê dilê Kurdan dalêsin.

Rast e, rewş krîtîk e, bê îstîkhar e, jî alî buyerên rojane de, jî alî siyaseta cihanî de her der mij û dûman e. Lê divê em hay jê hebin ku tiştê xwe li dor me pêcaye bes ne ev bêistîkharî û mij û dûman e. Gelek tişt jî hene ku dikarin asoyên pêşeroja me rohnî û zelaltir bikin. Rejîma Seddam ne rejîma xurt a berê ye. Erê jî berê jî çavsortir û xwînrejîtir bûye lê ordî û rejîmek şikestî ye derbek mezin xwariye, ew çekdarî, manewiyat û taqeta berê pê re nema ye. Miletê Iraqê ne pêre ye, iro gelek firsend peyda bûne ku hîn berfirehtir serî hilde. Prestîja Seddam ne li dinyayê û ne jî li herêma maye. Herkes dixwaze Seddam here lê di dîtina alternatîfêkî di şûna wî de li hev nakin. Roja ku ev alternatîf derkeve, Seddam wê biçê, ev roj jî ne dîr in. Û jî hemuyan jî muhîmtir iro li Kurdistanê, milletê Kurd hemû bi hev re rabûye. Li perçên Kurdistanê yê din û li dervayî welêt dilê hemû Kurdan bi serîhildana Kurdistanê Iraqê re ye. Potansiyelêkî milî li hundur û dervayî welêt, bi dîffûranî û hêviyên mezin amade ye. Iro, wazîfa mezin li ser partiyên siyasî, rêxistinên komelayetî û ilmî yê Kurdî û ronakbîrên Kurdan e ku vî potansiyelî bighînin hev, mueseşe û wasitên milî yê têkoşîna bi her awayî ava bikin û di rîya wan re vî potansiyelê milî li hundur; herçar perçên welêt û li dervayî welêt têxin hereketê. Ger ev potansiyel di hereketê keve, wê wek leyiyê gelek bendên pêş têkoşîna hilweşîne, mij û dûmana li ser têkoşîna me rake û serkeftina milletê me nêzik bixîne. Berî her tiştî, hêvî li ser me Kurdan e.

Şîrnex, Herzex, Kerboran, Farqîn....

## Xelk li hember zordestiyê serî hildide

**Li hember zulm û zordestiya dijmin li Şîrnexê 3000, li Herzexê (Îdil) 4000, li Kerboranê(Dargeçît) 5000, li Farqînê (Silvan) 2000 kes meşîyan. Leşkerên dijmin bi tanq û tivingan êrîşî meşan kir. Li Şîrnexê 2, yek li Kerboranê li Herzexê jî 3 kes, hatin kuştin**

Li Şîrnexê roja 28'ê Sibate leşkerên Tirk nehêştin gundiyan ku debara xwe bi civandina komîra kevirî dikin, komirê top bikin. Li ser îfrazê xelkê, cendirman li xelkê xistin û gule bera qatîrên wan dan, nêzî 250 qatîrî kuştin. Li ser vê yekê gundiyan dest bi meşê kirin. Gundiyan jî der û dor jî tevî meşê bûn û di gel gef û tehdîdên leşkeran meşîyan bajêr. Berî ku meşvan têkevin nav bajêr, leşkeran ew gulebaran kirin. Xortek bi navê Salih Talayhan (17) û Şeyhmus Yonga 2 hatin kuştin. Sadik Bayram (19), Bahattin Kunter (17), M. Emîn Arda û Osman Ozmen birîndar bûn. Bûyer, piştî li nav bajêr hat bihîstin, komikên jî 20-30 kesî pêk hatin, sloganên Kurdî diavêtin, êrîş birin ser daîrên resmî, leşkerî, bankayan û bi keviran camên wan anîn xwarê.

Du rojan piştî bûyerê nêzî 500 kesî meşêke bêdeng pêk anîn û çûn ser gorra herdu xortên şehîd.

### Herzex (Îdil)

Roja 3'ê Adarê leşkerên Tirk avêtin ser mezra Kuvakê, ku li ser gundê Sirtê ve ye û gund jî girêdayî qeza Herzexê ye. Cendirman gundî li ser bêdera gund civandin û di bin baranê de bi seetan bi wan talîm dan kirin, bi erdê re kaş kirin û li wan xistin. Yek ji wan jî muxtarê gund Ahmet Aslan bû. Piştî hewqas zulm, edî kêrî gihast hestî. Gundi li hember leşkeran rabûn, emrê wan bi cî neanîn. Li ser vê yekê cendirman ew gulebaran kirin; Şemdin Aslan (35), Davut Aslan

(24) û Omer Faruk (26) birîndar bûn. Cendirman 35 gundî jî bi xwe ra birin û li emniyeta Mêrdîne îşkence bi wan kirin.

Li ser bûyera mezra Kuvakê esnafên Herzexê dikanên xwe venekirin û tevî xelkê ku ji gund û mezrayan hatibûn, bûn û meşîyan. Li dor 4000 kesî ber bi garnîzona leşkerî meşîyan û bi Kurdî slogana "Bimre Zordestî" qîriyan. Leşkeran, bi emrê failê bûyera mezra Kuvakê, Bînbaşî Mustafa Karatay meşvan gullebaran kirin. Di buyerê de telebê lîseyê Ahmet Guleç (18) û bi navê Ekrem Oruç du xort hatin kuştin. 5'ê wan giran, 25 kes jî birîndar bûn. Xelkê bi qehremanî li hember lûleyên tanq û tivingan bi keviran li ber xwe da. Li dor 200 gundiyan hatin girtin.

Dewletê du roja derketina kuçê, çûyin û hatina bajêr jî qedexe kir. Roja 6'ê Adarê li dora 2000 kesî bi sloganên Kurdî meşîyan; "Bijî xelkê Kurd ê bi hesiyet", "Bimre Zulmkarî" û hwd.

### Kerboran (Dargeçît)

Li qeza Mêrdîne Kerboranê jî bo protestokirina bûyerên Şîrnex û Herzexê, roja 7'ê Adarê esnafan dikanên xwe venekirin û xelkê bajar û gundên der û dorê, nêzî 5.000 hezar kesî meşîyan. Piştî 10 deqîqan leşkeran meşvan gullebaran kirin. Bi navê Rukiye Bozkurt jineke 30 salî şehîd ket, bi navê Ekrem Alp, Turkan Şahîn, Lokman Çetîner, Nezîr Altin, Abdulkadir Akyuz, Ahmet Guneş û Mewlûde İnan 7 hemwelatî jî birîndar bûn. Di eynî şevê

de li dor 3000 kesî meşîyan û qetliama leşkeran tawanbar kirin. Roja din li dor 2500 kesî çûn ser gorra Rukiye Bozkurt. Dû re bi sloganavêtin meşîyan nava bajêr. Xwendevan neçûn mektebê, esnafan jî dikanên xwe venekirin.

Roja 16'ê Adarê jî li dor 3000 kesî bi daxwaza berdana girtiyên xwe, xwestin bimeşin. Hinek meşîyan jî, lê dî re jî aliyê leşkerên Tirk ve bi teqînê hatin belavkirin. Esnafên Kerboranê jî 7'ê Adarê heta Armanc ket çapê jî hîn dikanên xwe venekiribûn. Şofêr jî naçin ser erebên xwe.

### Farqîn (Silvan)

Li Farqînê, li dor 1000 xwendevanî, tadeyî û zordariya îdara mektebê protesto kirin. Xwendevan ji bo îstîfaya îdara mektebê slogan avêtin. Polis û leşkera êrîş birin ser meşê. 5 xwendevan birîndar bûn. Birînen Mustafa Şîr İnan û Serdar Turan giran bûn. Piştî vê bûyerê Qeymeqamê bajêr mecbûr ma ku daxwaza xwendevanan bi cî bîne û mudûrê lîsê Ramazan Gurbuzel û Celal Gul ji kar hatin avêtin.

Êvara 20'ê Adarê xelkê Farqînê dîsa meşîya. Meşvan çûn ber mala qeymeqam, daxwaza berdana 33 kesên ku di bûyera 2 roj berê de hatibûn girtin, kirin. Polis êrîşî meşê kir, 4 kes birîndar bûn. Piştî seetêke din xelk dîsa civiya, carek din meşîyan. Vê carê xelk çû ber mala amirhêzê (komutan) garnîzonê. Amirhêzê garnîzonê daxwaza meşvanan anî cî û kesên girtî berdan.

## Li Diyarbekir şeva 8'ê Adarê

(Gulçîn-Diyarbekir)

Li Diyarbekirê roja 8'ê Adarê şevê mezin pêk hat. Şeva 8'ê Adarê jî aliyê Komîsyona Jina a Komela Mafên İnsanî ve hatibû amadekirin. Şev gelek qelebalix bû. Şevê bi axaftina serokê komelê Hatib Dîcle dest pê kir. Dûre li ser mane û naveroka rojê, endama Komîta Rêvebir a komelê û seroka Komîsyona Jina, Nazdar Kahramanêr peyivî. Wê di axaftina xwe de li ser rewşa jinên Kurd weha got: "Em dizanin ku jina Kurd di nav çerxek sêserî ya kedxariyê da ye...Ewê rizgariya jina Kurd bi rizgariya netewa wê û bi ya çîna wê ra bê. Mêtîngehkar wexta ku îşkence û zulm û tadeyî dikin, ferqê naxin nava jin, zarok û mêran. Di têkoşîna gelê Kurd de jî divê ev ferqiyet tunebe".

Nazdar Kahramanêr dî re qala qehramanên Kurd yê dîrokî, wek Besê, Leyla Qasim kir û demand "Zekiye Alkan di sala 1990'î da bi berxwedana xwe li ser bircên Diyarbekirê agirê Newrozê geş kir... Di van dawîyan de li Licê, li Cizîrê, Li Nisêbînê, li Kerboranê jinên Kurd li rêzên pêşî di ên berxwedanan de ala têkoşîna bilind kirin".

Dû re Leyla Zana li ser mijara "Jinên Kurd yê Şehîd" axaft. Ew di axaftina xwe da li ser rola

jinan di protestoyên kitleyî de, di berxwedanên girtiyan de sekinî û jinên Kurd yê şehîd yek bi yek bi nav kir û bi kurtî qala jiyana wan kir.

Dûre bi dor, keçeke pêşmerge xanima şehîd Necmettîn Buyukkaya; Cemile Buyukkaya, Sakine Arat û diya şehîdekî Kurd Fatma Kartal ku ji gundekî herêma Botan hatiye surgunkirin axaftin. Şev bi stranên Kurdî û bi xwendina helbestan dawî hat. □

### uzir

Di hejmara berê de (112-113) di rûpela 6'an de li ser sûretê Ebdulah Peşew jî ber sebebê teknîkî xêzek çapraz hatibû danîn. Em jî ber vê şaştiyê uzirê xwe jî Ebdulah Peşew û ji xwendevanên xwe dixwazin.

ARMANC

Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo, Hesen Mizgin, Lewend Firat, Mirza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Eli Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmisaniy

Adres : Armanc P. Box: 6004 172 06 Sundbyberg Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11063 TELE KC Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigtgivare: Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen Postgö: 50 37 99-9 ISSN: 0348 7365



**Daxuyaniya Beşdarên Kurd ên Konferansa Stockholmê**

Di 17ê Adara 1991ê de, piştî Konferansa Navnetewî ya li ser Mafên Gelê Kurd, civînek hat lidarxistin ku ji 100 kesî zêdetir Kurd ji welatên cihê, ji temsîlkarên partiyên siyasî, komelan, komîtan, rojnaman û şexsiyetan tê de beşdar bûn ji bo Konferansê hatibûn tê de beşdar bûn. Piştî guftugoyek temamî ya ji bal beşdaran li ser rewşa hemû perçên Kurdistanê û bi taybetî Kurdistanê Iraqê û li ser Konferansa Navnetewî ya Stockholmê, civîne bi yekrayî li hev kir ku;

1- Piştigiriyek temam bide serfihildana gelê Kurdistanê Iraqê, pîrozbahiyên xwe pêşkêşî pêşmergan, hêzên çekdar ên din û xelkê beşdar ê serfihildanê bike.

- Piştigiriyê Cephê Kurdistanê bike, karûbarê gelê Kurdistanê Iraqê bimeşîne, bidestxistiyên biparêze û muhawele bike ku hemû awe ihtiyacıyan bişîne ji bo gelê Kurd.

- Beşdaran piştigiriyê xwe eşkere kirin ji bo serfihildan û têkoşina gelê Iraqê ya ji bo demokrasîyê û rizgariyê.

2- Piştigiriyê muhawela partiyên Kurdistanê a ji bo civandina Kongereyê Mîlî ya Kurdistanê dike, daxwaz dike ku karê civandina wê kongrê bimeşînin û lez û bezekê bidînin.

3- Piştigiriyek tam dide têkoşina mîletê Kurd ê li hemû perçan ji bo bidestxistina rizgarî û hemû mafên Kurdan yê qanûnî.

4- Qîmetek hêja dide Konferansa Stockholmê û encamên wê, sipasiyên xwe pêşkêşî Komîta Swêdî ya ji bo Mafên Insanî yê Kurdan, gel û hukumeta Swêd û Federasyona Kurdan a Swêdê dike.

**Beşdarên Kurd ên Konferansa Stockholmê  
17. 03. 1991**

**Cejna Newrozê bû ya Tirkan (!)**

(Roza Dilan - Diyarbekir)

Xelkê Kurd ji ber pîrozkirina Newrozê heta nuha her tim ji dewleta Tirk tade, zulm û êriş didit. Lê nuha dewleta Tirk ji dixwaze wê rojê pîroz bike. Lê ne wek cejneke Kurd, bi naverokek din wek cejneke Tirk!

Belê, Waliyê herêmi Hayri Kozakçioğlu bi nivîsekê ku ji 11 waliyên bajarên Kurdistanê re şandiye, daxwaza pîrozkirina Newrozê ji wan dike û dibêje; **"Newroz di teqwîma rojhatî û ya Tirkan de roja yekemîn e. Tirk di 21ê Adarê de bi rêberiya gurê boz çiyayê hesinî quldikin û**

**dighijîn welatê bav û kalan û ji ber vê yekê Newroz wek cejna roja Tirkan a gîhaştina welatekî nû hatiye îlan kirin. Di nivîsê de dide zwiyakirin ku qaşo 'eşîreta Geregêçî di wexta Abdulhemîdê Duemîn de 21ê Adarê bi navê Newroz wek cejna Yorukan (koçer) pîroz kiriyê"**

Dewleta Tirk bi vê gavê dixwaze pêşî li pîrozkirina Newrozê bigre. Çewa heta nuha bi zor û şidetê nikaribûn pêşiyê li pîrozkirina Newrozê bigrin, wê bi vê taktîka dawî ji nikaribin pêşî lê bigrin.

**"Mirovên herêmê ji ber ku nikarin fikrên xwe diyar bikin, nexweş in"**

(Roza Dilan - Diyarbekir)

Li Diyarbekir ji bo cejna tibê li Unîwersîta Dicleyê merasîmek pêk hat. Di merasîmê de serokê Odeya Tebîbên Diyarbekir Mahmut Ortakaya ji axift; Li herêmê, mirov ji ber ku nikarin fikrên xwe diyar bikin, nexweş in. Ji bo selameta herêmê û siheta jiyana mirovan divê Walîtiya Herêmî ji holê bê rakirin. Mirovêkî ku nikaribe fikrên xwe bide diyarkirin wê çawa bi sihbet be. Li herêmê îşkence û mafên mirovî hertim li rojevê ye. Ev jî hertim tesîrê li ser mirovan dike.


Di merasîmê de waliyê herêmê Hayrî Kozakçioğlu jî di nav guhdaran de bû. Wî reaksiyona xwe bi kenek bi deng da nişandan.

**M. Şêxmûs Cibrân:**

**"Ne bi zimanê min be, ez îfade nadim"**

M. Şêxmûs Cibrân di mahkema xwe ya ji ber nivîsa wî ya ku di kovara Medya Guneşî de hatibû weşandin, protesteyek bi balkeş nişan da. Wî li ser potîkekê (paçekê) qanûna 2932 nivîsand û bi devê xwe ve şîrêz kir û derket huzûra mahkemê. Hakim herçiqas îsrar kir ku M. Şêxmûs Cibrân potîk ji devê xwe rake û bersîva wan bide, lê wî bi ya xwe kir û potîk ji ber devê xwe ranekir.

Li ser vê, hakim mahkema M. Cibrân ji neçariyê paşde avêt (gîro kir).



**EGER ME JI HEBÛNA HIN NEMIR...**

Mamosteyê edebiyata Kurdî **Mam Hejar Mukriyanî** şeva 21ê Sibatê wefat kir. Hingê ez li Parîsê bûm. Li ser mirina Mamosteyê mezin, Enstîtuya Kurdî li Parîsê şevê amade kir û deftereke bîranînê vekir. Min jî li defterê, rêzine kurt nivîsin;

*"Mamostayê Hêja... Te dabû ser rîya Seydayê Ehmedê Xanî yê nemir. Nuha tu jî, mîna Seyda, bûyî nemir... Tu her bijî..."*

Hevalekî ku hingê li kêleka min bû, li rêzên min nihêrî û bi ken got,

-Malava, Mamoste wefat kiriye, tu dibêjî "her bijî..."

Her bijî...

Meriv ji kê re û kengê dibêje her bijî? Li ser mirina kê?

Bi bawerîya min, meriv li ser mirina şair û nivîskarekî mîna Mam Hejar, bê şik û bê guman, dibêje "her bijî." Ji ber ku ew ê bi eser, berhem, avahî û xebatên xwe her bijî. Di dil û mêjiyê me de. Li ser rûpelên rojname, kovar û kitêbên me. Li cîh û war û avahiyên me.

Tiştê ku Mam Hejar dike nemir; jiyana wî ya dirêj[70 sal], xebatên wî yê siyasî, edebî û ronakbîrî û bîr û baweriyên wî yê pêşverû, welathezî û merivheziyê ye. Hê di xortiya xwe de, wî beşdarî li tevgera Komara Mehabadê kiriye, gelek rojname û kovar derxistine, di gelek rojname û kovaran de nivîsiye, 22 kitêb weşandine, şîrên Omer Keyyam wergerandine kurdî, hin kitêbên tarîxî ji farisî wergerandine kurdî, "Dîwana" Seydayê nemir Melayê Cizirî, di gel şerh û ferhengêkê, weşandiye, "Mem û Zîn" a Seydayê nemir Ehmedê Xanî wergerandiye zaravayê mukrî û soranî û di gel şerh û ferhengêkê, weşandiye û şîrên xweş, giranbiha û abadîn afirandine û bi nivîskarî û şairiya xwe ziman û edebiyata Kurdî dewlemendtir kiriye...

Merivekî weha dê, bêguman, her bijî. Mirin şexs û bedena wî ji me bi dûr dixîne, lê belê ruh û giyana wî, bîr û baweriyên wî, eser û berhemên wî her li ba me ne. Ew nemir in.

Nemirî ev e. Kesê nemir bi vî awayî dibe nemir...

\*\*\*

**Milan Kundera**, nivîskarekî navdar ê çekoslawakî, di romana xwe ya dawîn "Immortalité"[Nemirî] de behsa du celeb nemiriyê dike; nemirîya biçûk û *nemirîya mezin*. Nemirîya biçûk ew e ku meriv, piştî mirinê jî, di hişê nas, dost û cîranên xwe de dimîne, di

bîr û hişên wan de dijî. Heta ku ew jî dimirin. îcar nemirîya mezin ew e ku meriv, piştî mirinê, di hişê nenas û xelkê de dimîne, di bîr û heşê netewe, gel û navçeyekê de dijî.

Herkes nemir e. Mezinê malekê, giregire malbatekê ji bo mal û malbata xwe nemir e. Keyayê gundekî ji bo gundê xwe, heta demekê, nemir e. Piştî mirina wî, nişkekî du niş, bavekî-du bav wî bi bîr tîne. Meriv û nasên wî, xelkê gund behsa wî dikin. Lê paşê, ew ji bîr diçe. Nemirîya kesên weha bi sînor e; him ji aliyê wextê, him ji aliyê cîh û war ve.

Lê, nemirîya nemirên mezin bêhed û bêhidûd e. Jê re ne cîh û ne jî war qim dike. Ji ber ku wan bi eser, berhem, avahî, xebat û fikrên xwe ruh û can dane neteweyekî û herweha însaniyetê. Nemirên mezin ne keyayê gundê xwe, mezinê malbata xwe û serekê koma xwe ya biçûk in. Ew ne li pey keyatî, mezinahî û serekîyê ne. Nemirên mezin wîjdanê neteweyê xwe, pîvanê meriv-evîniyê û sembolê xebat û lebatên rast û durust in. Ew li pey afirandin û avakirina eserên nû, ronensans û şoreşên fikrî û nûjenkirin û dewlemendkirina medeniyet û neteweyan in. Ew li pey dewlemendî û rengîniya jiyana siyasî, çandî, edebî û civakî ya civatan in. Ew li pey eser, afirîn û avahiyên wisan ku gel û neteweyên wan û însaniyet pê serbilind bibin. Ew ne *merivên idare û idarekirinê* ne, ew merivên afirîn û avahiyê ne.

Jiyana rojane, xire-cir û teşqelên rojane, şer û dijîtî û kar û xebatên nedûrbîn mîna berfa li ber tavê ne. Ew dihelin û winda dibin. Ew îroj hene, sibê tune ne. Lê eser û berhem tav in. Ew îroj jî hene, sibê jî hene, dusibê jî hene... Ew şewq didin me, ronahî direşînin ser me. Ew jiyana me ya basît û dinya me ya ku bi şer û teşqelan tijî ye, ronî dikin.

Loma xwediyên van eser û berhemên nemir in. Loma ew her û her hene, ew her û her dijîn. Kî dikare bibêje ku Goethe najî? Kî dikare îddîa bike ku Shakespeare îroj ne li mal û bîrxanên îngilîzan e? Kî dikare bibêje ku dengê senfoniye Beethoven, Mozart, Schubert û h.w.d. îroj aheng û aramiyeke xweş nade dil û ruhê merivan? Kî dikare bibêje ku eser û avahiyên Gaudî ne serbilindiya gelê Katalan û Spanyayê ne? Kî dikare bibêje ku rêzên nivîskar û şîrên nûjen ên farisî bi bîr û fikrên Firdewsî nehatine neqşandin?..

\*\*\*

Gava em çavê xwe li ser tarîxa gel û neteweyên pêşketî digerin, em dibînin ku nemirên van gel û neteweyan pir in. Û ew her dixwazin, dil dikin û hewl didin ku nemirên wan pirtir bin. Ji ber ku piraniya nemiran nişana pêşketina wan, garantiya pêşeroja wan û sembola jiyana ronakbîriya wan e. Lê li ba gel û neteweyên paşdemayî û bindest rewş bervajiyê wê yekê ye. Li van welatan hejmara nemiran pir kême û bîr û şûra pirkirina hejmara nemiran tune. Bêguman nemir bi eser û avahiyên xwe dibe nemir. Kes bi qise û gotinan nabe nemir. Lê belê, ji bo avakirin û afirîna eser û berhemên jî rê, gav û îmkân divên. Gel û neteweyên ku dikarin van rîyan vekin, gavan bavêjin û îmkanan peyda bikin, dikarin bibin xwediyên nemiran.

Mîna her gel û neteweyê paşdemayî, hejmara nemirên Kurdan jî, mixabin, pir kême e. Hejmara kesên nemir ên kurd bi pêçiyên tiliyan dikare were hejmartin. Nemirên Kurd mîna stêrikên serê sibê ne; kême in, hindik in. Mixabin ku ev yeka rastiya me ya tahl e. Ma em dikarin navê çend nemirên Kurdan di warê huner, çand, edeb, avahî, felsefe, îlim û siyasetê de bihejmêrin? Di warê çand û edebiyatê de, **Mîr Celadet Bedîrxan**, sala 1941, weha dibêje; "... ji eserên beriya îslamiyê hesêb tiştê nemaye. Piştî îslamiyê jî nav Kurdan gelek şahîr, edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi Erebi, bi Farisî an bi Tirkî nivîsandine û ji wan mîlet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine... Yê ku bi Kurmancî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe nedaye zimên û çêtir kêfa xwe ji pirsên Erebi û Farisî re anîne..." [Hawar, hej. 33]

Nemir tav û stêrik in. Meriv li gora wan rê li ber xwe rast dike. Seydayê Ehmedê Xanî bi xêra nemirên beriya xwe rê li ber xwe rast kir û bi xwe jî bû nemir. Mam Hejar bi xêra Seydayê Ehmedê Xanî rê li ber xwe rast kir û bi xwe jî niha bû nemir. Seydayê E. Xanî di şîreke xwe de nemirên beriya xwe bi nav dike û weha dibêje;

*"Min da ilama kelamî mewzû Alî bikira li banê gerdûn  
Bi nav e riha Melê Cizêrî  
Pê hey bikira Elî Herîrî  
Keyfek we bida Feqiyê Teyran  
Heta bi edeb bimaye heyran  
Çi bikim ko qewî kesed e bazar  
Nîn in ji qimaş re xerîdar"*

Bi hêviya ku ji qimaşê Kurdî re jî hebin xerîdar û bazara Kurdî nemîne kesed û me jî hebin bêtir nemir...



## RAMANÊN RAMANWERAN

Piştî perestroykayê, bi taybetî ji sala 1988'an vir de li Yekîtiya Sovyet hişyarbûna miletiyê dest pê kir. Salên dirêj, gelek pirsên netewî bi sloganên dostî, biraî û wekhevîya netewan hatibûn nixamtinê. Problemên bi salan berevbûyî, mîna pingava ku benda li ber xwe bibe bûn lêhî, lêmişt. Ewê lehiya tevî qirş û qal gemar û nerastiye ya bi salan berevbûyî, gelek kirinên baş jî li ber xwe birin. Li pîrri ciyan nasjonalizma sert serî hilda, pêwendiyên baş ên ku di navbera netewan de hatibûn girêdan birrîn.

Netewên Sovyetê yê xwedî komar, ku îro di parlamentoyên xwe de pîrsa serxwebûn û wekhevîyê datînin, li her ciyê dinivîsin û dibêjin, wekî mafên wan ê netewî ji aliyê hukumeta navendî de hatiye pêpeskirinê, îro bi xwe mafên netewan di nav xwe de pêpes dikin, zilm û zorê tînin serê wan. Vê rewşa aloz dixwazin bona karên xwe bi kar binin, meramê xwe yê nasjonalistî bînine serî. Li Uzbekîstanê bi lêdan û kuştinê, Tirkên Mêsxetî ji nav xwe derxistin, li Gurcîstanê komara Osêtiya Başûr, ku di sala 1922'an de hatibû avakirinê, rakirin, li Moldavyayê her tişt kirine

**Berî her tiştî di komarê de şertên usa hatin saz kirin ku pareke Kurdan mecbûr man ku ji komarê derkevin. Paşê jî problema Êzîdîtiyê derxistin meydanê. Ji talebextiyê re di dîroka gelê Kurd de nimûnên usa ne kêman in, ji bo perçekirina gelê me hertim faktora olî dane bikaranîn.**

ku Gagaûz; miletekî piçûk e li başûrê komarê ku dijî otonomî-ya xwe ava neke. Ermeniyên Qerebaxê eva êdî nêzikariya sê salan e ku nikarin bigihîjine mafên xwe yê çarenûsî.

Û li her ciyê xwîn tê rêtin, li her ciyê mal tînin şewitandin.

Rewşa Kurdan jî xirabtir bû. Li hinek ciyên Uzbekîstanê, Qirgîzîstanê û Ermenîstanê ew jî hatin derkirin.

Li Ermenîstanê ku van heftê salên dawiyê ji bo Kurdan gelek tişt hatibûn kirinê, tu bêjî piştî perestroykayê ji bo geşbûna jîna netewî mecalên hê baş saz bûn û bi rastî jî di destpêkê de biryar hatin stendin ku li bajarê Erîvanê de şanoya Kurdî ya dewletê ya profesyonel vekin, di bajêr de merkeza çanda Kurdî avakin. Eger heta niha tenê di dibistanên gundên Kurdan de heftê du seetan zimanê zikmakî dixwen-din, biryar hat stendin ku di dibistanên gundên mayin de jî, ciyê ku Kurd lê pir in, dersên zimanê Kurdî derbas kin.

Lê piştî tûjbûna problema Qerebaxê û sertbûna pêwendiyên navnetewî di komarê de, ne tenê ew biryar hatin jibîrkirin, lê herçî yê hene jî ketin xeterê.

Berî her tiştî di komarê de şertên usa hatin saz kirin ku pareke Kurdan mecbûr man ku ji komarê derkevin. Paşê jî problema Êzîdîtiyê derxistin meydanê. Ji talebextiyê re di dîroka gelê Kurd de nimûnên usa ne kêman in, ji bo perçekirina gelê me hertim faktora olî dane bikaranîn.

Helbet ev problem ne nuh e û ji bo Kurden Êzîdî, ewên ku îro li Ermenîstanê dijî dîrokeke wan a

# Li Ermenîstanê çî diqewime?

A. Roj

taybetî heye, ya ku bi Cenga Cîhanê ya Yekemîn ve girêdayî ye. Lê piştî salên 60'î, gava dîtin ku di nav Kurden Yekîtiya Sovyetê de ji prosesa xwenaskirin û hişyarbûna miletiyê geş bû, ew problem hêdî-hêdî dihate hildanê. Û di gundên ku rûniştvanên wan hemû Kurden Êzîdî ne ew problem bawer bikî nemaye, li ba wan ên ku di gundên Ermenîyan de dijî

Sûriyê ji bo dijîtiyê tîxin nav hêzên Kurdan yê li wan welatan.

Li vir gilî ne tenê di derheqa Êzîdîyan de ye. Çawa rojname wan "Pûnik" dinivîse (nivîsarên wê paya pîrri li dijî Kurdan e) ew dixwazin kovarekê bi navê Dêrsim çap bikin. Di agahdariya wan de tê gotin, ew ên kovare xeynî zimanê Ermenî usa jî bi çend zimanên Ewropî jî çap bikin. Kovar wê bi temamî di derheqê problema Zaza de be. Meramê wan yê sereke ev e, ku bidin kifşê Zaza ne Kurd in. Di vî karî de wan ji xwe re çend hevalbend li Ewropayê jî dîtine.

Lê gelo ji bo çî ev hemû tişt tînin kirin?

Bi texmîna me li vir çend mane hene. Maneya pêşîn û ya sereke ew e ku bidine kifşê ku xelkê ku îro li Kurdistanê jorîn dijî û xwe

**Gotin û nivîsarên ku dibêjin Zaza ne Kurd in, Êzîdî ne Kurd in, ew tenê gavên pêşîn in. Dûre wê binivîsin ku him Zaza û him jî Êzîdî bi koka xwe Ermenî ne.**

Kurd nas dike, gişk ne ku Kurd in. Gotin û nivîsarên ku dibêjin Zaza ne Kurd in, Êzîdî ne Kurd in, ew tenê gavên pêşîn in. Dûre wê binivîsin ku him Zaza û him jî Êzîdî bi koka xwe Ermenî ne. Rast e ne pîrri vekîrî lê tîza usa îro êdî tî xwiya kirin. Eger Zaza û Êzîdî ne Kurd bin û bi koka xwe Ermenî bin, wê gavê îro li Kurdistanê jorîn bi milyonan Ermenî hene. Bi baweriya mirovên ser vî tîzê diparêzin eva yeka ji bo doza Ermenîyan li Tirkîyê dikare bibe bingeh.

Van her du salên dawiyê Azerbêcanê êdî çend caran bi girtina rîya hesin Ermenîstan kirîye nava hesara aborî û ziyaneke mezin dayê. Rast e Ermenîstan û Gurcîstan bi hev re xweşgotina dibêjin, lê di navbera wan de jî problema axê û hinek problemên

Dibe bi van gavên xwe yê li dijî Kurdan dixwaze xizmeta wan welatan bike. Bi baweriya me ev mane jî ne dîrî aqilan e.

Îro em pîrri caran li Ermenîstanê slogana "dewletek, netewek" dibîhîzin. Ji bo pêkanîna vî sloganê Kurden Êzîdî ku îro li Ermenîstanê mane hasêgeha herî mezin in. Lema jî wan ji Kurdistanê, ji dîrok û çanda gelê Kurd bêpar dikin, ku karibin wan asimîle bikin.

Dawiyê divê em bêjin ku ronakbîrên Ermenîyan yê ku wiha difikirin gelek kêman in. Lê ew pîrri aktîv in, hukumet û çapemeniya Ermenîstanê ya îroyîn bi xurtî piştigiriya wan dike.

Gelên Kurd û Ermenî cîranê hev ên hezar salan e, bi hev re pîrri rojên giran derbas kirine û rewşa wan a îroyîn usa ye, ku wê di

**Gelên Kurd û Ermenî cîranê hev ên hezar salan e, bi tevayî pîrri rojên giran derbas kirine û rewşa wan a îroyîn usa ye, ku wê di pêşerojê de jî hîn bi kêrî hevdu bîn.**

din jî hene ku tim sarbûn û bêbaweriyê dikine nav pêwendiyên wan. Lema jî Ermenîstanê daye ser rîya serxwebûnê û dixwaze bi her awayî pêwendiyên xwe bi cîranên xwe yê başûr, Tirkîyê û Îranê re xweş bike.

pêşerojê de jî hîn bi kêrî hevdu bîn. Lema jî em hêvîdar in gelê Ermenî, ronakbîrên wî yê pêşewatiya miletê xwe dikin, wê pêşîya van çend kesan bigrin û nehêlin dilsariya ku ev kes dikine nava herdu gelan, mezintir bibe. □

## Şerê Xelîcê û Mesela Kurda

S. Esmer

Eger meriv tenê di pencera Kurda re li mesela şerê Xelîcê binêre meriv dikare hinekî kêfxweş be, ji bo ku Sedam dijîminê Kurda yê herî zalim bû. Kirinên wî di heqê miletê Kurd de bi serê xwe lêkolînekê dixwaze, pirtûkan dadigre. Ji alî din ve Kurda bi serê xwe nikaribûn Sedam û wê quweta destê wî bişkinin. Bêguman belavbûna quweta wî ji Kurda re baş bû. Lê divê ev yeka neyê wê manê ku şerê Xelîcê şerêkî bi heq bû. Û em ne mecbûr in ku sûretê George Bush tîxin berîka xwe û bibêjin DAY bavê me ye, em hevalê Amerîka ne. Her çiqasî tu hêzên Kurd tu tiştekî weha negotîbin jî, nêrînek weha bi eşkera nedabîn xuyakirin jî, lê di hin panel û sohbetên piçûk de ev tişt hatin gotin û di nav wan de hevalê rêxistinên jî hebûn. Divê berî her tiştî bête zanîn, ku heval ji Amerîka re tunene, Amerîka ji xwe re xulama, nokera çê dike. Ji hêla din ve Amerîka ne gotiye ez hevalê Kurdan me, ez alîkariya Kurdan dikim. Îcar hewce nake meriv xwe li ber baranê şil bike. Divê em vî jî eşkere bikin, ku şerê Xelîcê ne ji bo Kurdan dest pê kiribû, ne ji bo Kuweytê jî çê bûbû, ne jî ewqas qadîrnasbûn ku ji bo biryarên NY bi cî binin ev

kar kirin. Mêrika ji bo kara xwe û petrola xwe û kontrola mintiqê, belkî Îsrail jî, ji belak mezin xilas kirin. Yanî eger mebest biryarên NY bûna NY ji bo Filistinê jî biryarên wisa dan. Lê kesekî ambargo li dijî Îsrailê lan ne kir û ne fikirin, ku bi zora çek wê ji erdê Filistinê derînin.

Bi baweriya min divê Kurd dev ji van çîroka berdin û li xwe vegerin. Îro firsendek baş çê bûye divê Kurd ji wê istifade bikin. Eger Kurd wê firsatê jî berdin, wê tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê zêde li paş keve birînen me mezin bibe.

Ji destpêka şerê Xelîcê Cêpha Kurdistanê Iraqê hinekî liviya. Hin delegasyonên xwe şandin Amerîka, Îngilîstan, Fransa, Suudiyê û Tirkîyê. Lê li Kurdistanê negerîyan, hêzên cuda cuda, ji her çar perçên Kurdistanê nedîtin, nêrîn û pêşniyarên wan nestendin, fikra xwe jî, ji tu kesî re negotin. Xebatên Kurdistanê ku bi hev re dihatin meşandin, hema bigire dan sekinandin. Kurd gava ku dikevin tengayê pir tiştên xweş dibêjin, meriv dibêje qey ji tecrubên xwe ders girtin û êdî wê siyasetek Kurdistanê bidin meşandin. Lê hema çîrûskek ronahî xuya bike te di xwe lê girtin û dev ji her tiştî ber-

adan. Li gorî ku xebatên Kurdistanê sist bûne, mana xwe îfîmada Kurda dîsa ne li ser Kurda ye. Gava ku Kurd hev nebînin, xebatê jî bo yekîtiyê nekin, ev noqte pîrri girîng in ev cîdîyet, prestîj û bi serketina tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê dixê bin munaqesê. Biraderên Kurden Kurdistanê Iraqê divê bikaribin herin her derê û bi her kesî re pêwendiyên deynin. Lê divê ev pêwendî nebin sedemên fetisandina xebata tevgera rizgarîya Kurd li perçên din ên Kurdistanê, divê zanibin çawa Kurd hewceyî yekîtiyê ne di vî dema ku li her perçê Kurdistanê jî ber xwe yekîtiya miletê çê dibe, divê xebatên jî bo yekîtiyê bê westan, bîn ajotin. Cêpha Kurdistanê Iraqê di mesela yekîtiya de bi perçên din re divê hêzên ku bi dilsozî jî bo vî yekê kar dikin bide pêş. Helbet hêzên siyasî li seranserê Kurdistanê hemû mesûl in ji van karan. Îro pêwîst e xebatên xwe zêdetir bikin bi taybetî hêzên Kurdistanê Tirkî divê hin cidîtir li meselê binêrin xwe berdin nav milet û bi militanî, çî legal û çî illegal bixebitin. Lewra ji alîkî listikên dijîmin li ser milet, ji aliyê din ve xelkê bixwazin ji xwe re alternatîfekî wek xwe bidin çêkirin. Helbet ev girêdayî hêzên siyasî û politîka wan e. Îro rojra yekîtiyê ye. Ji xwe di hundir de xelkê bûye yek, eger hêzên siyasî jî bikaribin milê xwe bidin hev bi çî navî dibe bila bibe û bi hev re bixebitin wê dijîmin nikaribin hespên xwe li meydanê bibezînin. □



Axaftina S. Dicle li ser navê TEVGERê di Konferansa Stockholmê de

# "Mesela Kurdî, mesela tayinkirina qedera miletekî bi destê xwe ye"

Spasî Komîta Swêdê a ji bo Mafên Însanî yên Kurdan dikim ku di vê dema ku gelê Kurd herî pirtir muhtacî piştgiriya navnetewî ye, wê ev konferans civand û li vir firsenda axaftinê dide me jî.

Bi îzna we, di vê dema ku ji bo me hatiye veqetandin de, ez dixwazim li ser rewşa dijwar a gelê Kurd ê Kurdistanê bin destê Tirkîyê rawestim, ku siyaseta nijadperest-şovenîst a dewleta Tirk sebêbê wê ye.

Kurdîstana Tirkîyê bi firehbûna xwe ya 220 hezar km çargoşe, mezintirîn perçê Kurdistanê ye, bi serê xwe nêzî tavayiya hemû perçên din e. Ji bo ku dewleta Tirk hebûna Kurdan înkâr dike û her kesê ku li Tirkîyê dijî, Tirk hesab dike, îstatîstîkên resmî yên rastî di derheq nufûsa Kurd a vî perçeyî de nînin. Lê li gor otorîtên cihê, dezgehên ilmî û aliman nufûsa Kurdîstana Tirkîyê ji sedî 25'ê (%25'ê) tavayiya nufûsa Tirkîyê ye. Bi vî hesabî, nufûsa Kurdên Tirkîyê dike qasî 15 milyonan. Em Kurd vê reqemê ji bo xwe esas digrin. Meqamên resmî yên Tirk, herçend misêwa nufûsa Kurdan gelek kêmtir didin xwiyakirin jî, demekê berî niha Serokkomarê Tirkîyê Turgut Ozal bi xwe jî xeyrî-resmî qebûl kir ku nufûsa kurdan li Tirkîyê 12 milyon e.

Divê li vir em balê bikşînin ser nuxtekê ku, ev nufûsa Kurd a 15 milyonan, ne eqliyetek e ku li ser erdên Tirkan dijîn, lê miletek e ku ji tarîxê bi hezar salan vir de li ser erdê xwe ye bi navê Kurdistan, piraniyê pêk tîne.

Herçî Kurd miletekî bi nufûsek ewqas mezin in jî, li Tirkîyê ne ku wek miletekî, lê wek eqliyetekê jî qebûl nabin. Komara Tirkîyê, berî 70 salan li ser erdên mîrasên împaratoriya Osmanî li ser bingehên nasyonalîzma-şovenî hat danîn ku ev nasyonalîzm xwe dispêre nijadperestiya Tirk. Ji bilî Tirkan hebûna hemû millet û eqliyetan hat înkarkirin. Milletê Kurd gelek caran li hember vî siyasatê serî hilda. Lê Tirkîyê hemû serîhildanên milî yên Kurdan bi hovîti û bi bê însafî şikandin, qetlîamên mezin kirin, bi kutleyî berê xelkê dan surgûnê û heta îro ev siyaseta ku ji Tirkan pêştir kesî qebûl nake meşand. **Li Afrika Başûr çawa ji bo meriv karibe bibe xwedî mafên hemwelatîti, yê maf û azadiyên demokratîk û însanî divê meriv spî be, li Tirkîyê jî ji bo meriv karibe xwedî mafê hemwelatîti yê maf û azadiyên demokratîkê divê meriv Tirk be, yan jî huwiyeta xwe ya milî ya rastîn înkâr bike û bêje "ez Tirk im", wek Tirkekî hereket bike. Ferqek Tirkîyê jî Afrika Başûr heye, ew jî ji alî maf û azadiyên ku ji bo spîyan hatiye dayîn Tirkîyê hê paşdetir e.**

Loma milletê Kurd ji hemû maf û azadiyên milî û demokratîk û ji mafên însanî bêpar e. Hebûna

Kurdan di van çend salên dawiyê de, herçî di çapemeniyê de di nav xelkê de û di nav derûdorên xeyrî-resmî de hatiye qonaxekê ku nikare bê înkarkirin û ev derûdor herçî ne wek miletekî, lê qene wek grûbek etnik a cihê hebûna Kurdan qebûl dikin jî, siyaseta dewletê ya resmî, qanûna esasiya Tirkan û qanûnên din hê îddîa dikin ku bi navê Kurd tu tişt nîne û hemû kesên ku li Tirkîyê dijîn Tirk in. Ziman û Kultura Kurdî qedexekirî ye. Qanûnên ku axaftin û nivîsandina Kurdî, gotina ku bêje "ez Kurd im" qedexe dikin, yên ku cezayên giran didin xwedî lêderketina li mafên wiha tebîî û însanî dimeşin.

Herwekî tê zanîn ku deh sal berê, Tirkîyê bû şahidê înkîlabeka eskerî ya van 30 salên dawiyê. Înkîlaba ku di 12'ê îlona 1980'yî de bi ser ket, parlementoya Tirkîyê bela kir, partiyên siyasî, sendîka û komelên demokratîk ên din girt. Pêla teror û qetlîamek wiha rakir ku îro jî hê dawî lê nehatiye. Bi deh hezaran însan hatin avêtin zindanan, bi hezaran wan mecbûr man ku derkevin derveyî welêt. Dewlet li ser esasekî antî-demokratîk ji nuh ve hat avakirin. Gelek qanûnên ne demokratîk hatin qebûl kirin ku azadî û mafên qismî yên berî înkîlabê jî ji holê rakirin. Îro herçî eskeran dev ji îderekirina rasterast a hukumetê berdane jî, herçî parlamento vebûye, partiyên Tirk ên nuh hatine danîn û sivilan rasterast îdere xistine destên xwe jî, meriv nikare li Tirkîyê ji demokrasîyê rastîn bahs bike. General di riya ordiyê, polis û teşkilatên eşkere û dizî yên eskerî û îstîxbaratî de dixwazin di qedera welêt de bibin xwedî peyv.

Ji hedefên esasî yên înkîlaba eskerî ya 12'ê îlona 1980'yî yek jî ew bû ku wê tevgera gelê Kurd a ku di salên 1970'yî de gurr û xurt bûbû, bipelêxe. Ji herkesî bêtir Kurd bûn hedefa êrîşên cûntayê, teror û cinayetên mezintirîn li Kurdistanê rûdan. Lê belê di van deh salên ku ji înkîlaba eskerî bi vir de pêk hatin û bi taybetî ji nivê paşîn ê van deh salan û bi vir de herçî li herêmên Tirkan ber bi jiyaneke sivil, heta hinekî jî demokratîk de hin guhertin çêbûn jî, li Kurdsitanê tu îşaretêk nerm-bûnê peyda nebû. Li herêmên Tirkan êdî îdara urfî nîne, esker îdarê rasterast di destê xwe de nagirin. Lê belê qanûnên ku li van herêman derbas dibin, li Kurdistanê Tirkîyê derbas nabin. Li Kurdistanê qanûnek bi navê Qanûna Halê Fewqelade tê tetbîqkirin ku di esasê xwe de qanûnên dema îdara urfî bi cih ûn. Ev qanûn ji alî waliyekî bi navê Waliyê Herêmî yê Halê Fewqelade (yanî bi awakî waliyê koloniyân) tê tetbîqkirin. Wali xwedî selahiyetên gelek fireh e. Ordî, polis, cendîrme, hêzên kontrgerilla yên bi navê hêzên serî tînin binavkirin û milîsên çekdar ên ku li Kurdistanê ne, di



**Sekreterê Giştî yê PPKK Serhad Dicle** "Li Tirkîyê mesela Kurdî, ne mesela aqaliyetekê yan jî grûbek etnik e. Kurd miletek in ku ji hemû mafên xweyên milî û demokratîk, ji mafên xwe yê însanî hatine bêparhiştin"

bin emrê wî de, çi bigre her roj karên êrîş û terorê dimeşin. Waliyê Herêmî, gava bixwaze dikare karmendên sivil û memûrên dewletê ji wezîfê bigre, cihê karê wan biguhêze. Wali, însanên ku şik ji wan bê kirin dikare surgunî derveyî herêmê bike, gundan vala bike, dest deyne ser erd, xanî, yan jî wasitên neqlyatê yên xelkê. Fealiyetên sendikan, grev, meş û mitîng tabîî îzna waliyan e. Wali dikare weşanên herêmê û weşanên Tirkan yên ku agahdariyên buyerên herêmê didin, bide girtin. Di fîliyetê de biryarên mahkeman li gor fermanên wî dertên. Ji ber hemû van selehiyet û karan jî heqê tu kesî tune ye ku li tu maqamî giliyê walî bike.

Li Kurdistanê, bi taybetî di van pênc salên dawiyê de rewşa şer tê jiyân. Bi bahana hêzên çekdar ên Kurd, eskerek mezin li Kurdistanê hatiye bicikirin. Ji bo terora li ser xelkê bê zêdekirin, hêzên kontrgerilla yên taybetî hatine avakirin, jê pêştir ji nav nufûsa mintiqê, hêzên milîs yên xwefiroş hatine danîn. Ev, bi taybetî li gundan terorek bi şiddet bikar ûn. **Ji 1985'an bi vir de, ji ber pêla terora dewletê, bi hezaran însan hatin kuştin, bi deh hezaran kes li qereqolên jendirme û polîsan îşkence dîtin. Bi sedan gundên bi ser Hekariyê, Wanê, Sêrtê, Mêrdînê, Şirnexê, Batmanê û Agriyê ve bi tevayî hatin valakirin.** Hin gund, rasterast bi emrê Waliyê Herêmî hatin valakirin û xanî bi buldozeran hatin hilweşandin, hin ji wan di riyên xeyrî-resmî re bi êrîşên hêzên eskerî tînin valakirin, mal, zêvî, rez û baxçên gundiyan tînin şewitandin, pez û dewarên wan tînin talankirin. Hin ji gundiyan jî ji bo ku mintiqe hatiye terorîzekirin, ew bixwe, mal û erdên xwe bicîh dihêlin, koçî herêmên Tirkîyê yên din dikin.

Bi taybetî ji ber şerê Xelîcê, xelk tûşî halekî gelek dijwar hat. Tirkîyê herçî, erdên xwe, meqerên

nivîskarên wan de mehkeme vebûn, hin ji wan jî deh salan zêdetir ceza girtin. Bi dehan dawên ku li hemberî wan hatine vekirin, hê dom dikin. Li hember tadeyî, komkirin û cezayan, kovarên Özgür Gelecek û Vatan Güneşi mecbûr man ku dawî li jiyana xwe binin. Yê din jî herçî mehane yan jî heftane ne jî, carnan ji çend mehan carekê û di demên hê dirêjtir de dertên. Garantiya jiyaneke domdar a tu yekê ji wan jî nîne.

Her wekî ku tê zanîn li Tirkîyê qanûnek bi hejmara 2932'yan heye ku axaftin û nivîsandina Kurdî li her alî, li mal û kuçê jî qedexe dike. Hukumeta Tirk, van çendên dawiyê eşkere kir ku wê vî qanûnê bide rakirin. Beyana hukumetê di raya giştî ya hundur û derva de îmajek wilo peyda kir ku her kesî got Kurdî êdî wê bi her awayî serbest be. Bi taybetî hukumetê xwest ev îmaj xurt bike. Lê piştî xebatên di parlamentoyê de yê li ser vî qanûnê dan xwiyakirin ku niyet qet ne serbestkirina zimanê Kurdî ye. Ger ev qanûn bê guhertin bes li malê û li kuçê axaftina Kurdî wê serbest be, jê pêştir li hemû warên din qedexeyên ser Kurdî wê her hebin, heta cezayên li hember axaftin û nivîsandina Kurdî tînin girankirin. Derxistina kovar û rojnaman bi zimanê Kurdî, çapkirina kitêban wê dîsa qedexe bin wê dîsa tûşî cezayê giran bibin. Bi kurtî, ji rakirina qanûna 2932'yan niyata hukumeta Tirk ne ew e ku zimanê Kurdî serbest bike, lê dixwaze xwe ji wê tengasiya ku li hundur û derva ji ber pîrsa Kurdî ketiyê, xelas bike, carek din dixwaze raya giştî bixapîne.

Ya muhîmtir ji bo serbestbûna zimanê Kurdî, bes rakirina qanûna 2932'yan tîr nake. Di qanûna esasî ya Tirkîyê de, di qanûna çapemeniyê de, di qanûnên hînbûn û xwendinê de, di yên ku zimanê Tirkî wek zimanê resmî yê tik û tenya qebûl dikin de, di qanûna partiyên siyasî, ya avakirina komelan, ya meş û mitîngan de, gelek hukmên ku Kurdî qedexe dikin û mecburiyeta Tirkî tînin hene. Ger qanûna esasî û qanûnên ku me navê wan da neyên guhertin serbestî ji bo ziman û kultura Kurdî çênabe.

Tirkîyê, endamê Milletên Yekbûyî ye, beyanname mafên însanî, Peymana Helsînkî û Peymana Parisê ya ku di çerçewa Konferansa Ewleyî û Hekariya Ewrûpayî de hat û gelek peymanên din ên navnetewî îzme kirine, teahuda bicîfanîna van peymanan daye. Tirkîyê dixwaze bibe endamê Civaka Ewrûpa. Lê belê Qanûna Esasî ya Tirkîyê û qanûnên din û bi taybetî jî siyaseta dewletê ya di fîliyatê de, ji ber bêdengî û xemsariya navnetewî, bi her awayî li dijî peyman û teahudên navnetewî ne.

Li Tirkîyê mesela Kurdî, ne



# Dîtinên beşdarên li ser Konferansa

**Hevalê me Zinarê Xamo li Konferansa Stockholmê bû û pîrsa "Hêviyên te ji konferansê çibûn û ji van hêviyên te çi qas bi cî hatin? Ji kesên beşdarî konferansê pîrsî.**

**Serhad Dicle (Sekreterê Giştî yê PPKK):** Konferansê li derva, li Ewrûpa çê dibin armanca wan ew e ku miletê Kurd, tevgera wî li dinyayê bidin nasîn û piştigiriyê ji bo wî peyda bikin û xurttir bikin. Gava meriv vê bide ber çavê xwe, bawer dikim ku konferanseke heja bû. Li ser nasandina mesela Kurd û tevgera wê gelek tiştên qenc hatin gotin. Û di demeke gelek muhîm de çêbû. Gaveke baş e.

**Mahmûd Baksî (rojnamevan, nivîskar):** Berî konferansê min digot wê întereseke navnetewî ya mezin ji konferansê re hebe, min bawer dikir ku wê şexsiyetên meşhûr bîn; ew nehate, ev yek. Dudu, întresa hukûmeta Swêd jî pîr kêm bû. Min digot bi kêmanî wê Wezîrê Xaricî Sten Andersson bê. Ew jî nehat. Tiştê wê konferansê yê herî baş hêzên siyasî yên Kurd, em bibêjin ewên ku bi salan e bi hev re xeber nedidan di nuxteyê de hatin ba hev. Ez hêvî dikim ji bo wan siyasîyên Kurd wê bibe platformek. Ya din jî ev konferans dikare mafên Kurdên multecî, ya jî Kurdên ku li Swêd dijîn, rewşa wan ji alî sosyal û kulturî ve çêtir bike. Di vî warî de jî konferans baş e.

**Anders Fagerström (rojnamevan, Swêdî):**

Ez bawer dikim konferans bi ser ket. Dikaribû him ji alî Kurdan û him jî ji alî navnetewî ve bilindtir bibûya. Lê cardin jî konferanseke baş bû, bi dûzan bû û berî her tiştî jî di demeke bi îsabet de bû.

**Mihemet Uzun (nivîskar):** Pîr baş bû, bi her awayî baş bû. Programek pîr bi rêk û pêk û mukemmel pêşkêş kirin û hat qebûl kirin. Ez hêvîdar im ku di pratîkê de jî li gor programê gav bîn avêtin.

**Medet Serhat (abûqat):** Konferans baş bû. Em dixwazin konferansê hîn mezin him li Kurdistanê û him jî li Ewrûpayê çê bibin.

**Hemreş Reşo (nivîskar):** Konferans gelekî baş derbas bû, axaftinê bûn di ciyê xwe de bûn. Em hêvîdar in konferansê mezinir bibînin. Û hêviya min a mezin jî ji civîna piştî vê ye, civîna Kurdan, divê ew di nav xwe de tiştê bikin.

**Prof. Nadir Nadirov (Kimyager):** Konferans rind derbas bû. Gelek xebertanên xweş hatin kirin. Tenê hêviya me ew e vana bêne serî. Merivê di konferansê de divê sibê du sibê li dinyê belav bin û qewlên konferansê bi cî binin.

**Serafettin Kaya (abûqat):** Ev konferans bi xwestina hinek hevalan baş derbas bû. Feqet xwestina me tiştê din hebû, me dixwest ku di konferansê de bibêjin Kurd neteweyek e û ji bo ku ew xelas bibin divê qedera xwe bi serbestî tayîn bikin. Feqet ev tişt nehate nivîsandin. Bi baweriya min mafê însanî dewsa mafê çarenûsiyê nagre. Ev tişt nehate gotin. Lê wekî din baş dibînim.

**Şêx Îzeddin Husênî (Şexsiyetekî dinî û siyasî ji Kurdistana Îranê):**

Konferans, konferanseke serkevî bû. Ez dibêjim zor baş bû, çimkî li ser gelek tiştên girîng hate sekinandin û mesela Kurd metreh bû. Û esesen ew new'e konferansa bo me wek miletekî jêrdest ku dengê me nagihîje derekê û xelk li me napirse gelek muhîm e. Loma jî konferansê wiha ji bo me wek

bingehêk, wek mîmberê wiha ye ku em bi vî riyê dengê xwe digihînin dinyayê. Xelk ji me tédigihîje, bi taybetî jî li Ewrûpa xelk dibîne ku em di çî halî de ne.

Meseleyeke din ku ji bo min zor girîng e, ew jî ew e; ku Kurd beş beş in, hêzên siyasî kêm hev û din dibînin. Di konferansê û kongreyên wiha de hemû perçeyên Kurdistan hev du dibînin, hevdu dinasin bi hev re dipeyvin. Bi vî rengî yekîtiya miletê Kurd nîşan didin. Lê gilîyê min jî, ji birayên xwe yên Kurd heye, ku tezuhmên wan kêm e, hetta, hêzek ku bikaribe nahêlê hêzeke din bête qebûl kirin. Hetta li vir jî diktatoriyê nîşan didin, manî dibin ku xelk bi firehî di konferansê wiha de beşdar bibin. Întîzara min heye ku dinya guheriyê û rewşa dinyayê di van çar pênc salan de pîr guheriyê. Hêzên siyasî, miletê Kurd divê xwe li gel van şertan tethîq bikin, zêdetir nêzî hev bibin. Nuxteyên me yên muştêrek pîr in divê em van nuxteyên muştêrek derxin pêş, ku nuxteyê me ya muxalîf jî hebe dibê bi çavê musamaha, dostayetî û biratiyê lê binêrin û hel bikin.

**Dr. Mahmûd Osman (Yek ji berpirsîyên HSK):** Welle konferanseke baş bû. Çunkî gelek kesên Kurd, Swêdî û xerîb hatibûn, wek li Paris, di konferansê de behsa Kurd bû, behsa gelşên Kurdan û ew rezalet û cerameta ew dewletên ku li Kurdan dike hate kirin. Û tê de daxwazên xurt hebûn, heta

tayînkirina qedera xwe bi destê xwe. Û dawê li hemû hukûmetan dike ku mafê Kurdan bête nasînin. Bi raya min konferanseke gelek baş bû. Bê guman ev konferans ne ya Kurdan bû ku bi kêfa xwe çî dixwazin tê de binivîsin. Viya dostên me yên Swêdî çêkiribûn, divê em respektî wan bikin. Bi raya min nikaribûn tiştê zêdetir bibêjin.

**Cemal Alemdar:**

Bi baweriya min konferanseke pîr biserketî bû û di wextê pîr hesas de çêbû. Û em zor bextiyar in ku konferansê ev netîce da. Bi taybetî di demeke wiha de Kurd karibin dengê xwe bigihînin cîhanê zor muhîm e.



Şêx Îzeddin Huseynî

**Thomas Hammarberg (Serokê Dezgeha Parastina Zarokan a Swêdî):**

Ez bawer dikim pîr baş û xweş derbas bû. Hewayeke wiha hebû ku em bi hev re bixebitin û qet perçebûn çênebû. Me deklarasyonê qebûl kir ku berê xwe dide Koma Netewan. Em daxwaz dikin ku vî gelşê di çarçewa Konferansa Rojhilata Navîn de bigre dest. Emê ji hukûmetê bixwazin ku ew, vî yekê têxe programa xwe ya derva.

**Hoşiyar Zebârî (Berpirsîyarê Derve yê PDK-Î)**

Konferanseke baş bû, serkevî bû. Deklarasyona ku derket endamên kongrê derxistin. Divê xebat bibe. Nuha rewşê baş hatiye pêş, rewşa miletê Kurd berz e, îhtîmameke navnetewî pê heye. Divê em jî guh bidinê û pêş de tiştê weha çê bikin û xelkê li ser kêşa Kurdan agahdar bikin.

**Keya Îzol (Weşanvan):**

Ji alî beşdarbûna Kurdan û xerîban sewiya konferansê zêde ne bilind bû Me zêdetir dipa, hêviya me ew bû. Lê ji alî naverokê ve, ew dokumantasyonên ku hazir kiribûn, ya jî li vir hatin hazir kirin û deklarasyona dawiyê gelek baş in. Lê divê meriv bizanibe sewiyê çima bi vî hawayî hatiye girtin, ew jî meseleyeke din e.

**Roald Hovring (Rojnamevanê Norwecî):**

Baş derbas bû. Wek şexs jî min gelek fêde jê girt. Û ez bawer dikim ku hêzên Kurd jî bi pêşniyarên xwe dengên xwe dan bihîstin.

**Karin Soder (Wezira kevn a Biyanîyan û Seroka kevn a Partiya Center):**

Bi baweriya min konferanseke mukemmel bû û em gelekî kêfxweş in ku me ev konferans çêkir. Tiştê gelek baş bû ku ji gelek welatan û rêxistinên Kurd hatin ba hev û bi hev re problema gelê xwe munaqêşe kirin û li ser

**Hemîde H. Derwêş (Serokê Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, parlamenter):**

Konferans ji mesela Kurdî re xizmet e. Bêtir jî gerek mere spasiyê ji wan kesên biyanîyên ku alîkariya konferansê kirin, bike. Wek ku xuya bû, ji me bêtir li pêşveçûn û serkeftina konferansê miqate bûn.

## Daxuyaniya Konferansa Stockholmê

**Konferansa Navnetewî ya bi navê "Bicîhanîna Mafên Kurdan" di navbera 15-17ê Adara 1991'ê de li Stockholmê ji alî Komîta Swêdî ji bo Mafên Mirovayî yê Gelê Kurd hat civandin.**

**Di nav 240 beşdarên ji 20 welatan nimîmendên partiyên siyasî yên Kurdan, yê komelên civakî û kulturî û her wiha şexsiyetên Kurdî yê li penaberiyê hebûn. Her wiha nimîmendê û parlamenter û yê din ji partiyên siyasî yên Ewrûpî jî amede bûn. Di nav beşdarên de, jê pêştir berpirsîyarên resmî ji rêxistinên mirovayî yê navnetewî û yê siyasî hebûn ku hin ji wan çavdêr bûn. Çapemenî (Medîa) hatibû dawetkirin.**

**Di Konferansê de raporên li ser rewşa mafên mirovayî ya sahen Kurdî yê li Iranê, Iraqê, Sûriyê, Tirkiyê û Yekîtiya Sovyetan hatin pêşkêşkirin û analîzkirin. Konferansê di ronahiya rewşa îroyîn a Rojhilata Navîn de, munaqêşa çareseriyên kir û di encamê de daxuyaniya jêrîn ya bi navê "Daxuyaniya Stockholmê ya li ser Mafên Gelê Kurd" qebûl kir:**

Zordariya li ser ji 20 milyonî zêdetir Kurdan êdî divê ji alî civaka cîhanî neyê qebûl kirin. Ew tehdîdek e li ser aştî û îstîkara Rojhilata Navîn û tecawuza li ser standartên mafên mirovayî ye ku bi peymanên navnetewî hatine tespît kirin.

Tecawuzên li ser mafên mirovayî li Kurdistanê ge-

lek salan pêk hatin û niha jî sistematîk û bi berfirehî dom dikin; girtinên siyasî, îşkence, cezayên giran ên piştî mahkemekirinên xapînok û ne li rê yan jî qet bê mahkeme; "windabûn"; cezayên mahkemên fewqelade; şerê kimyayî, valakirin û hilweşandinan cîwaran, erzak û wasitên jiyanê; inkara mafê ziman, edebiyat, muzîk û hînbûna tarîxa xwe; rewşa dijwar û nemirovayî ya li kampên penaberan.

Gelê Kurd tu caran jiyanê demokrasîyê nedît, jê xerabtir, xweidarekirinek bi qîmet nebû para wî. Iraqê - welatê ku li ser kaxezê soza awayek otonomiyê ji bo wan da- di riya zordarî û pêşkêşkirina karmendên xwe yê kûkla re ev peyman bînpê kir.

Iran, Iraq, Sûriyê, Tirkiyê û YKSS hemûyan di demên cihê cihê de, bi zanebûn hewl dan ku di riya teşebûsa guhertina mîzana demografîk a herêmên Kurdî re şexsiyeta mîli ya Kurdî bibişefin.

Heta ku ev bîedaletî dom bikin, wê tu aştîyê rastîn li Rojhilata Navîn peyda nebe.

**Konferans:**

**DAXWAZ DIKE** ku hukûmetên Iranê, Iraqê, Sûriyê, Tirkiyê û Yekîtiya Sovyetan Beyana Navnetewî ya Mafên Mirovayî, her wiha peymanên mafên mirovayî qebûl bikin û wan li Kurdistanê û herêmên din ên ku gelê Kurd lê dijî bi her awayî bicîh binin.

Konferans, bi taybetî ji van her pênc hukûmetan

îmkanên hene rawestiyar. Ev jî pîr muhîm e.

**Vena Larsen (Seroka Komîta Piştigiriyê Kurdan a Norwecî):**

Bi baweriya min baş hazir bûbû û deklarasyonê baş hat qebûl kirin. Lê çî heyf ku kesên siyasî hindik bûn.

**Orhan Kotan (Şef redaktorê Kurdistan Pressê):**

Baş e, konferanseke baş e. Di çapa xwe de, li gor perspektîva xwe konferanseke pozîtîv e.

**Hemît Kiliçaslan (kadroyeke siyasî):**

Konferans bi netîca xwe baş bû. Lê di çêkirina wê de gelek kêmasiyên ku ji alî Kurdan ve çêbûn meriv bijmêre. Hin şexsiyetên ku divê têde beşdar bibûna têde tunene. Lê deklarasyon ji alî politikî de hinekî dagirtî ye, tevî ku li hin nuxtan dikare rexne bê girtin. Û bawer dikim ku êdî Kurd jî bawer dikin mesela Kurd ji amatoriyê derdikeve, rîyeke profesyonelîyê distîne, rûpeleke nûh e.



# Stockholmê

**Zinar Soran (KUK):** Konferansên weha ji bo gelê Kurd gelek feydeyên wan hene. Wexta dostên Kurdan însiyatîfên wanî digrin, meriv dibîne ku Kurd êdî xwedî dost in, êdî ne bi tenê ne. Bêguman meriv dikare gelek tecrubeyên baş ji vê konferansê derxe.

**Ferhad Şakelî (Nivîskar):**

Bi dîtina min meriv dikare ji du aliyên ve li konferansê temaşa bike; yek ji alî birêvebirin û karê wan ez dibêjim ne baş bû, ne bi wê başiya ku me dipa bû. Naveroka kongrê ji dîsa aliyên baş hebûn, lê belê beşdarbûna Kurdan ne beşdarbûneke bi rêk û pêk bû,

Kurd karibin hin komîteyên xwe çêkin ku karibin temsîliya tevgera Kurd û milletê Kurd bikin, ji bo ku karibe wan biryaran çî li der û çî jî li hundur têxin jiyane.

**Sertac Bucak:**

Yekemîn, konferans bi serfirazî derbas bû û deklarasyon jî gelekî baş e. Ez bawer dikim xebata ji bo mafê mirovatî, ji bo Kurdistanê û ji bo mesela Kurd perspektîv hîn jî firehtir kir. Pêwîst e ku em vê xebatê bi hev re koordîne bikin û wan biryarên ku li vir hatine girtin binin çî.

**Hanefî Celeplî (Weşanvan):** Konferansê baş bû û biryarên ku hatine girtin jî biryarên gelek hêja ne. Tiştê herî baş ew e ku konferans tenê bi biryarekê namîne, gelek biryar hene ku wê berde wama xebatê bin. Di wî warî de karekî girîng pêk hat.

**Wildan Tanrikulu (Serokê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê):**

Konferansa Stockholmê gaveke nû e. Nuhîtiya wê jî bi ya min ev e, ji konferansê din cudatir programeke xebatê qebûl kir û ji bo bicîanîna vê programê jî çend komîte ava kir. Ev yek gaveke berbiçav e. Naveroka deklarasyonê jî bi ya min ji naveroka yê din pêşdetir e. Lê mixabin beşdariya konferansê hêviyên min neanî çî.

**M. Alî (Serokê HEV-KARê):** Însanên ji der ve hatin hindik in, piraniya kesên beşdar Kurd in. Lê dîsa konferans gelek baş derbas bû. Heger biryarên hatin girtin bîn bi çî anîn konferans ji hemû konferansên çêbûne çêtir e.

**Rifat Ballî (Rojnamevanê Tirk):** Ez ketibûm konferansa Parisê jî. Konferansa Parisê ji alî beşdarbûna kesên xerîb ve pirr qelebalix bû, mustewa wê bilind bû. Li Stockholmê min ev pirr nedît. Eynî tişt li ser beşdarbûna kesên Kurd jî dikare bête gotin. Întibayeke wiha bi min re çêbû fena ku hin serokên Kurd bi zanîn nehatin konferansê. Esas ez pirr ehemiyetê nadim cereyana resmî ya vir, ji ber ku difikirim ku Kurd jî pirr ehemiyetê nadinê loma ez jî nadimê. Ez bawer dikim di vê konferansê de îmkana hevdîtina rû bi rû ji bo Kurdan muhîm e. Vê konferansê îmkaneke da hêzên Kurd ku rû bi rû hev û du bibînin. Bi qasî ku min dît Kurdan ev keys jî girt. Bi taybetî rêxistinên Kurd ên ji Tirkîyê, wer xuyaye ku hin tişt girtine rojeva xwe, ji bo ku hîn baştir bi hev re bimeşin, hîn baştir bi organîze bin wê hin gavan bavêjin, ez wiha hîs dikim. Tamasên Anqerê bi Celal re, rûdanên bakurê Iraqê, rûdanên siyasî û leşkerî bawer dikim ku Kurdên Tirkîyê xist hereketê. Lê dîtineke min a wiha jî heye, nikarin nebêjim. Kurdên Tirkîyê bi gelemperî bi rengekî doktrîner, îdeolojîk xwe nêzî meselan dikin û ji bo wê jî di meşandina siyasî de hin zaafên wan hene. Loma jî nizanin li hember bayê reformê yê ku nuha li Anqerê tê wê pozisyoneke çawa bigrin.

Min ew bi pirr hazir nedîn. Bi ya min di arîfa van rûdanên gelekî muhîm de divê hêzên Kurd hîn bêtir siyasî û reel bin.

**Emîr Qazî (Serokê Partiya Serxwebûnê ya Kurdistanê Iranê):**


Li ser Konferansa Stockholmê bi giştî baweriya min ew e ku tiştêkî musbet û baş bû, bi qazanc bû. Bes ew tiştên ku min ji vê konferansê dipan ew çêbûn.

**Prof. Şakirê Xudo (tarixnas):**

Bi ya min konferansê gelek baş bû û ji bo Kurdan biryarên baş hatin girtin. Ji îro û pê ve jî heta derecekê top di destê Kurdan de ye.

**Hatice Yaşar (Kadroyeka siyasî):**

Hingavek baş e, lê ne bes e. Lê min di navbera Konferansa Parisê û vê konferansê de ferqek dît -tu dikarî wê ferqê bibêjî?-. Ferq ev e; wek Kurdekê li konferansa Parisê min şerm kir. Ewrûpayîyan li Kurdan şîret dikirin, aqil didan wan. Li vir ewa ku min dît, Kurdan xwe ferz kirin û Ewrûpayîyan jî bi îhtîram li Kurdan guhdarî kir.



**Prof. Şakirê Xudo Mihoyan**

Ji bo wê jî ez vê konferansê ji ya Parisê baştir dibînim.

**Şerefxan Cizirî (Endamê Meclisa Beledîya Botkyrka yê Partiya Çep ya Swêdê):** Bi dîtina min konferans bi giştî gihîşt armanca xwe. Cara yekemîn bû ku bi gelemperî li mesela Kurdan hat nêrin. Rekoman-dasyonên wê baş in. Kêmaniyên wê jî bê guman emê careke din rakin.

## Stockholmê ya li ser mafên gelê Kurd

DAXWAZ DIKE ku;

- Di zûtirîn demê de sirgûnkirina Kurdan û hilweşandina avayî, talankirina mal û hebûnên wan rawestînin;

- bi carekê de hefsiyên Kurd yê siyasî berdîn, îşkencê û cinayetên bisekinîn;

- rîya veqerên penaberên siyasî yê Kurd vekin û hemû mafên wan ên hemwelatîtiyê garantî bikin;

- hemû dezgehên di nav hêzên polis, emniyet û eskertiye de lexw bikin ku ew ji bo zordariya li ser gelê Kurd hatinê bikaranînin;

- sistemen xwe yê dadgehî û qanûnî li gor standartên navnetewî yê mafên mirovayî reforme bikin;

- zerara qurbanên îhlalkirinê derbasbûyî yê mafên mirovayî tazmîn bikin.

- Mafê ziman û kultura Kurdî, her wiha mafê çapemenî û wesane bi Kurdî qebûl bikin û qebûl bikin ku mafê zarok û ciwanên Kurd heye bi zimanê xwe hîn bibin û bixwinin;

- rêlibergirtina pêwendiyên navbera Kurdan li ser hudûdên navnetewî bisekinînin û dest bi hêsanîkirinê bikin;

DAXWAZ DIKE ku her ev hukûmet mafê tayînkirina qedera xwe ya gelê Kurd qebûl bikin, teşwîka guftûgoyekê li ser bidestxistina vî mafî bikin ku bi awayekî ku têkiliyên aşîdar, dualî û dîlovanî di navbera Kurdan û civakên cîran de peyde bibin.

- bangî hemû hukûmetan

dike ku îhlalên ku gelek Kurdan li wan welatên ku ew lê dijîn ji ber kişandine û dikêşin, di Komisyona Mafên Mirovayî ya Netewên Yekbûyî (UNCHR) de berpêş bikin;

- bangî hemû hukûmetan dike ku bi xurtî bixebitin ji bo bicîhanîna peymanan normên navnetewî a li ser bikaranîna çêkên kimyayî;

- bangî hemû hukûmetan dike ku doza Kurd -mafên mirovayî yê kesên Kurd û her wiha mafê tayînkirina qedera xwe ya gelê Kurd- di însiyatîfa aşî ya Rojhilata Navîn a piştî şerê Xelîcê de bikin xwedî par;

- bangî Sekreterê Giştî dike ku lê bikole û pêşniyar bike ku gelê Kurd û civakên din yê bê dewlet çawa çêtirîn dikarin di karûbarên Netewên Yekbûyî de bîn temsîlînin;

- daxwaz ji hemû hukûmetan dike ku pêwendiyên li gel penaberên Kurd li ser bîngehekî insanî bin û mafên penaberîya wan ji bi qasî yê penaberên grûbên din bin-cidiyeta zordariya li ser Kurdan a ku li welatên wan ê eslî bi ser wan de tê, li ber çav bigrin; -bangî Komisyona Bilind a Netewên Yekbûyî ya ji bo Mafên Mirovayî (UNHCR) dike ku, pêşdarîyek mezin bide parastin û alîkariya penaberên Kurd ên Rojhilata Navîn, bi taybetî ên Tirkîyê, Iraqê, Iranê, bangî hemû hukûmetan dike ku di vê meselê de piştgiriya UNHCR'ê bikin.

**Salih İnce: (Serokekî kevn ê Federasyonê)**

Ji alî organîzekirinê ve kêmasiyên konferansê hebûn. Ew jî ji me tê, ji wan Kurdên ku di organîzekirina wê de çî girtibûn. Lê dîsa jî bi giştî konferans serketî bû, baş bû. Biryarên ku ji konferansê derketin, erê di wan de jî hîn kêmasî hene lê dikarin bêjim ku deklarasyoneke xurt derket. Ez bawer dikim di pêş de wê konferans roleke baştir bilîze.

ew kesên ku dipeyivîn bi hawayekî baş û zanistî nedipeyivîn. Ew axaftinên du sê rojan li vir bûn, dikaribû di niv rojê de bibûna. Lê dîsa bêguman wek hengavek, wek konferansê din bi hemû Kurdan xweş e ku behsa Kurdan bibe û mesela Kurdan bi pêş ve here.

**Seid Mulla: (Ji seroktiya PHGK- li Sûriye)**

Eger konferans bide dû wan biryarên ku li vir hatin girtin, wê gaveke baş be di rîya Kurdan a dîrûdirêj de. Em hêvîdar in ku

## Konferansa "Navnetewî" ya Stockholmê

**Lewend Firat**

Yek ji biryarên Konferansa Parisê ew bû ku "di bin himaya Komîta Swêdê de, berî Tirmeha 1990'î konferanseke din ji nuh ve li Stockholmê bicive". Lê piştî du caran paşdexistinê, Konferansa Stockholmê nihayet di nivê meha Adarê de, bi beşdarbûyînek hindik yê kesên biyanî civiya. Xwedêgiravî komîta amadekarina konferansê dawetiyê ji gelek şexsên meşhûr re şandibûn, lê ji wan yek jî di konferansê de hazir nebûn. Dev ji hazirbûyîna wan berde, tu meselek piştgiriye jî ji konferansê re neşiyandin.

Ji bo sebeba paşdexistina konferansê; Serokê Komîta Swêdî ya ji bo Mafê Gelê Kurd C. H. Hermmanson di 21'ê Novembara 1990'î de wiha eşkere kiribû. "(...) Bersivên ku ji hêz û şexsiyetên navnetewî hatine gelek kêmin in. Em beşdariya konferansê hêz û şexsiyetên enternasyonal ji bo bicîkirina pîrsa Kurdî di rojeva navnetewî de, gelek pêwîst dibînin. Em hevidar in ku paşdexistina konferansê wê mecalê bide van kategoriyan ku bikaribin beşdar bibin."

Wê demê Iraqê Kuweyt îşxal kiribû û bi sedan rehînen Ewrûpî û Amerîkîyan di destê Seddam de êsîr bûn. Eşkere bû ku şexsiyet û dezgehên wan welatan ji bo wê meselê, nexwestin wê demê beşdarê konferansa Kurdan bibin. Meriv vevaya fêhm dike. Lê aqilê meriv nagire ku çima ew, îcar beşdar nebûn. Halbûkî rewş musaîf bû, li Kurdistanê Iraqê rûpelek nuh vebûbû. Gelo êdî Kurd dostên xwe wenda dikin?

Konferansê navnetewî ku ji bo Kurdan li derveyê welat çêdibin armanca wan ew e ku gelê Kurd li cihanê bidin nasîn û piştgiriye jê re bi dest xî. Yanî di rewşa îroyin ya Kurdan de, ev konferansê dibin konferansê propagandayê. Ji ber ku qerarên ku di van konferansan de tên girtin (bi dilê me yan ne bi dilê me) yek jî di praktîkê de nayê bicîanîn û nakevin jiyane. Dezgeyek Kurdan yekbûyî û yan jî otorîteyê me ya mîlî tuneye ku van qerara taqîb bikin û ji bo ku wan bicî binin, bixebite.

Ji bo wê jî di konferansê navnetewî yê wan de beşdarbûnên kesên biyanî esasî teşkil dikin. Şexsiyetên biyanî çiqas zêde bin û ew di welatên xwe de çiqas otorîter bin, ew jî alîkî de dibin wasita propagandayê ji aliyê din de ji wê gavê ew karin tesîrê li hukûmetên xwe, yan jî li dezgên humanîter yê welatê xwe bikin. Konferansa Stockholmê di wî warî de gelek qels bû, miqtaerek pirr hindik ji dervayî Kurdan û Swêdiyan di konferansê de hazir bûn. Kurd li ser navê parti û rêxistinên xwe di konferansê de beşdar bûn, lê hejmara wan ji hejmara hemû yê konferansê zêdetir bûn.

Axaftina ku Wezîra Multeciyan Maj-lis Löw li ser navê hukûmeta Swêdê di konferansê de kir, gelek qels bû. Wê dewletên dagirker ku Kurd di bin destê wan de ne "rehetsiz" nekir. Li ser rewşa multeciyan Kurd yê Swêdê sekinî.

Dostên me yê Swêdî "soz" dabûn ku konferansê "navnetewî" ya Kurdan çêkin û piştî du texîrkirinan di dawiyê de wan "soza" xwe anîn çî.



## Qetlîama Helepçe, Helepçeya azad jî bibîranî

(Armanç- Mîrza Bextiyar)

**Li Kurdistanê, li Ewrûpayê bi kurtî li her ciyê ku Kurd lê cîwar bûne qetlîama Helepçe hat bibîranîn. Helepçeya azad jî di sê saliya şehîdên xwe de ruhên wan şad kir.**

Sal 1988. Li Stockholmê, piştî ew rismên ku bi riya televizyona ketibû mala her kesî, bûbû birînek kûr û xwe bera dilê Kurdan dabû... Pîr, kal, zarok, jin, xort çî bigre hemû Kurdên Stockholmê û yên li hawîrdora wê, piştî dîtina wan rismên ku wê tu carî ji pêş çavên wan neçe; roja Şemîya 26'ê Adarê ku bi sedan kes li Ser-gelstorgê civiyan.

Tevî ku dinya ewr bû, stêrkên li ser hinarîkên gelek kesî diçirîsîn û hinek hebûn tew nikaribûn bigrîn jî!

Sal 1991. Roj 16'ê Adarê. Li Stockholmê, li bexçê Kungstragardenê (ku 200-300 metre ji Ser-gelstorgê dûr e) çî bigre hemû rûniştvanên Stockholmê civiyan e, bi dehan al di destê xort û keçên xaman da bi aşîmanan re hevnasî didin. Li ser kursiyê, berpirsiyarê Eniya Kurdistanê Iraqê Dr. Mahmut Osman diaxîfe: "Xelkê Kurd bi hêzên xwe yên pêşmergan ji sedî 95'ê Kurdistanê rizgar kiriye".

Belê di bîranîna qetlîama Helepçe de ku fatûra wê 5000 şehîd bû, rûçikên însanan dikeniya. Îcar dinya sayî bû, îcar stêrkên -hêsir- ji hinarîkan diherikîn bêtir diçirîsîn... Dengê Serokê Federasyonê Komelên Kurdistanê li Swêdê Vîdan Tanrikulu yê bilind li wê meydana meşhûr û fireh olan dida "Dema ku nuha em li vir Helepçe bi bir tînin, Kurdistanê Iraqê bajar bi bajar rizgar dibe. Li Helepçe ala rengîn diheje". Piştî meşê yek ji berpirsiyarên Federasyonê Mahmûd Kîper bi gotinên xwe rewş û hissên gelek beşdarên dide xwiyakirin:

"Ez sê sal berê ji qahra giriyam û isal jî ji kêfa".

Belê sê sal berê Helepçe di paşla Newrozê de şehît ketibû, lê îro Kurdistan, bi xwîna Newrozê di sîngê Helepçe de zil daye.

\* \* \*

Qetlîama Helepçe Li Almanya, Îngilistan, Fransa çî bigre li hemû welatên Ewrûpa hat bibîranîn. Li Almanya hin Kurdan balyozxana Iraqê ya li Bonn'ê îşxal kirin, dest danîn ser 3 sîlahên li balyozxanê û dû re teslîmî polis kirin.

Li Îstenbolê Komela Mafên Mirovî bi wefdeke (heyet) ji 20 kesî çûn ber balyozxana Iraqî, ta-cegulek reş danîn ber derê wê û gotin "Seddâm Huseyin û seroktiya Baasê ji ber cur-mên xwe yên jenosîdê û herbê divê di mahkemeyek navnetewî de bîn mahkemeyê kirin".

Li Kampên multeciyan Kurdistanê Iraqê ya Muşê, Kiziltepe û Diyarbekirê bi civînan Helepçe hat bibîranîn. Di civînê de yek ji berpirsiyarên multeciyan Salih Hacî Huseyin axaft û got: "Ew welatên ku çekên kimyayî fir-otîne Seddâm, şirikê curmên wî ne". Di dawîya axaftina xwe de wî got "destên xwe yên alikariyê dirêjî wî xelkê masûm bikin ku ew dixwazin dîktatorekî ku sûcê însanî kiriye, hilweşînin".

Qetlîama Helepçe li unîwersîteyên Înonu, Îstenbol, Çukurova, Yildiz, Dokuz Eylul, Ege û Dicle'yê bi beşdariya hezaran xendevan hat bi bîranîn.

## Newroz îsal bi manewiyatek bilind hat pîrozkirin

**Newroz li Kurdistanê Iraqê li ser erdên azad, di bin siya ala rengîn de, li Kurdistanê Tirkîyê bi meşên girseyî hat pîrozkirin. Bi tesîra bûyerên li welat, li dervayî welêt jî Newroz bi manewiyatek bilind hat pîrozkirin.**



Dimenek ji xwepêşandaneke Newrozê li Edenê

Li Kurdistanê Iraqê xelkê Kurd li ser erdê xwe yê rizgarkirî, bi parêzgeriya pêşmergan û di bin pêlên ala rengîn de Newroz pîroz kir. Li Kurdistanê Îranê jî xwe Newroz bi şeweyek resmî tî pîroz kirin. Roja 21'ê Adarê bi deh hazaran xelk daketin kuçên Cizîra Botan, Herzex (Îdîl), Nisêbîn, Kerboran (Dargeçit), Igdîr, Hezo (Kozluk) Diyarbekirê û gelek ciyên din. Nemaze xwenîşandanên herêma Botan û Mêrdînê gelek mezin bûn; li gor texmînan li Cizîrê 15 000, li Herzexê 10 000, li Kerboranê 5.000 kes meşîyan. Esnafan, li Cizîrê, li Herzexê, li Bis-milê, li Kerboranê, li Midyat û Farqînê dikanên xwe venekirin. Di van tevgeran de hêzên dijmin jî vala nesekinîn. Wan her terora xwe domand. Di van tevgeran de xelkê Kurd du şehîd û bi dehan birîndar dan. Li gor nûçeyên gihâştine me, li Nusêbînî 2 kes şehîd ketin, 4 kes birîndar bûn, li

Igdîrê kesek, li Batmanê 4, li Edenê jî 5 kes, birîndar bûn.

Li gelek ciyan bi meşên korsanî, bi şevên resmî an jî ne resmî Newroz hat pîrozkirin. Li Diyarbekirê, li Batmanê, li Wanê li Stenbolê partiya HEP'ê şevên Newrozê amede kirin. Li Stenbolê tagirên Partiya Pêşeng, Têkoşîn û Ala Rizgarî bi hev re bi şeveke dewlemend, Newroz pîroz kirin. Di şevê de ji 5000'î zêdetir însan beşdar bûn. Dengbêja bi nav û deng Şêrîn di her du şevên Stenbolê da jî beşdar bû. Newroz jî aliyê xwendevanên Kurd ve çî bigre li hemû unîwersîteyên Tirkîyê bi tevgerên cur bi cur hat pîrozkirin.


Li dervayî welatê Kurdan bi ma-

newiyatek bilind Newroz pîroz kirin. Li Almanya HEVKAR'ê li sê bajaran Newrozê pîroz kir. Li Aachen, Heiderberg û Hamburgê çêkir. Ji alî beşdarên û ji alî programê ve şevê mezin û dewlemend bû. Di programa şevê de Şivan, Gulîstan, Diyar û hwd. beşdar bûn. Li ser navê PPKK û Komela Mafên Mirovî ya Diyarbekirê axaftin hatin kirin. Li Stavenger jî bi beşdariya Ciwan Haco şevê hat çêkirin.

Li Stockholmê jî ji aliyê Federasyonê Kurdan şevê mezin hat çêkirin. Di vê şevê de, Şivan, Gulîstan, Delal û hwd. beşdar bûn.

Li Ewrûpayê bi dehan şevên bi vî rengî hatin çêkirin.

## Konferansa Stockholmê



Bistek ji Konferansê (Foto Armanç)

Konferansa Stockholmê ya "Bicînanîna Mafên Kurdan" di navbera 15 û 17'ê Adarê de li Stockholmê li mekteba LO (Sendika merkezî ya karkiran) ya Hasseludden çêbû. Konferans ji alî Komîta Swêdî ji bo Mafên Mirovayî yê Gelê Kurd ve hatibû amedekirin û nêzî 250 kesî beşdarî Konferansê bûn. Di nava van kesan de alim, siyasetvan, rojnamevan û parlementer hebûn. Hêzên Kurd bi resmî vexwendeyî konferansê bûbûn û dîtînen xwe pêşkêşî wê kirin.

Konferans ji alî Serokê Komîta Swêdî ji bo Mafên Mirovayî yê Gelê Kurd C. H. Hermansson ve hat vekirin. Wî di axaftina xwe de kêfxweşiyên xwe anî zimên ji ber ku konferanseke wiha li Swêdê çêdibe û însiyatîfa wê ji ku Komîta wan e. Li ser navê hukumeta Swêdê Wezîra Multeciyan Maj-Lis Löow axaft.

Li ser perspektîfa siyasî ya pîrsa Kurdî nivîskarê Îngilîz David McDowel û li ser kultura Kurdî jî profesora Fransîz Joyce Blau axaftin.

Li ser rewşa Kurdistanê Tirkîyê, bi navê TEVGER'ê Sekreterê Giştî yê PPKK Serhad Dicle, (axaftina wî em di rûpela 5'an de çap dikin), li ser rewşa Kurdistanê Iraqê, bi navê Cepha Kurdistanê Iraqê Hişyar Zêbarî, li ser rewşa Kurdistanê Îranê, berpirsiyarê KDP-Îranê yê Ewrûpa Kemal Dawûdî û li ser rewşa Kurdistanê Sûriyê jî Serokê El-Partî Ahmed Kemal axaftin.

Roja duduyên Konferansê li ser navê PKK Maşallah Öztürk, li ser navê 10 hêzên Kurdistanê Tirkîyê (TEVGER, Partiya Rizgariya Kurdistan, Tevgera Sosyalîst a Kurdistan, Kawar, Tekoşîna Sosyalîst, Partiya Karkerî Kurdistan 'KIP', Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê, Platforma Ala Rizgarî, KUK, Platforma Şoreşgerên Demokrat) İkrâm Delen, wek şexsan jî î. Şerîf Vanli, Şêx İzeddîn Huseynî û Omer Şexmûs axaftin.

Li ser mijara "Kurdistan û Huqûqê Navnetewî" Ove Bring (Di Wezareta derva ya Swêdê de danîşman) axaftinek balkêş kir. Serokê Parastîna Zarokan a Swêdê û yek ji însiyatîfگیرê konferansê Thomas Hammerberg li ser "deklarasyon û stratejîya xebatê" sekinî û got ku "mana Konferansê ew e ku qerarên em li vir digrin, pewîst e ku maqûl bin û divê di pratîkê de bi cî bîn".

Roja sisyê Konferansê li ser van mijarên jêr grûbên xebatê çêbûn. Grûban, xebatên xwe pêşkêşî konferansê kirin û li ser wan muneqaşe kirin.

1- Kurd û Yekîtiya Netewan, 2- Dezgehên Ewrûpî û Kurd, 3- Dezgehên Navnetewî yê Humanîter û Kurd, 4- Partiyên welatên OECD û Kurd, 5- Medîa (Press) û Kurd.

Di dawîya konferansê de deklarasyonêk bi navê "Daxuyaniya Stockholmê a li ser mafên gelê Kurd" hat qebûl kirin. (em deklarasyonê cûda çap dikin).

## Barzanî hat bibîranîn

Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê di 2'ê Adarê de li Stockholmê bi civîneke 12 saliya wefata Mustafa Barzanî bi bir anî. Di civînê de li ser jiyana û têkoşîna wî axaftin hatin kirin.

## Civîn ji bo wefatîkirina Hejar Mukriyanî

Di 2'ê Adarê de Federasyonê Komelên Kurdistanê li Stockholmê civînek ji bo munasebeta wefatîkirina şair Hejar Mukriyanî çêkir. Di civînê de li ser jiyana wî ya edebî, rola wî ya ku di edebiyata Kurdî de listiyê hate axaftin û çend şîrên wî hatin xwendin. Nêzî 150 kesî beşdarê civînê bûn.



# Întibayên min ên li ser seyaheta Sovyetê -II-

Hesen Mizgîn

**Kurd xwedî li doza xwe dernakevin**

Rojnama Kurda Riya Teze jî di derheq van bûyeran de tu informasyonan nade, yan jî naxwaze

**Li cem Redaksiyona Radyoya Gurcistanê**

Di roja 7.11.1990'î de me Radyoya Gurcistanê ziyaret kir. Serokê Duyemîn ê Radyoya

Di nav me Kurda de navê "Gurc" jî bo bi qewetbûnê, zexmbûnê tê bikaranîn. Hêvî ew e ku hûn vî sifetî li gor naveroka "Gurc" bi kar bînin.

Radyoya Gurcistanê bi serokê grûba me Reşo Zilan re hev-



Alma Ata; li gundê Jana Tilbisê zarokên Kurda bi kincên xwe yê "netewî". Navê dibistana wan jî "Jana Tilbisê ye" (Foto: Armanç)

bide. Îcar ku ronakbîr, xwenda û akademîkên Kurda, radyo û rojnama Kurda dengê xwe nekin û weke ku tu tiştek nebûbe hereket bikin, dê hêzên partîzanên Ermeniya bi awayek rehetir daxwazên xwe bi cih bînin.

Dihat gotin ku Kurdên li Kirgîzîstanê bi temamî koç kirine û berê xwe dane alî Rûsyayê. Kurdên li Ozbekîstanê bi temamî asimîle bûne. Li Azerbeycanê nêzî 40.000 Kurd hene, lê di resmîyetê de Kurd tune.

Kurdên li Gurcîstanê herçiqas "Ronahî" ava kirine jî, di komkirina hemû rewşenbîrên Kurda di bin siya vê komelê de bi serneketine. Di her fersendê de min bi kesên cuda cuda re munaqeshe li ser vê babetê vekir û hêvî û daxwaza yekîtiya wan anî zimên.

Kurdên li Gurcîstanê nêzî 33.000 û piranî li Tiflîsê dijîntevde Êzîdî ne. Wek urf û edetên li welêt qîz nadin der û ji der jî qîz naynin. Piştî destpêkirina Perestroïkayê, Kurda dest bi stendina qelen jî kirine. Qelen di navbera 4-5 hezar Ruble de ye û di dawetan de boxçevêkirin heye. Di boxçevêkirinê de pêşî mirovên bûk û zavê tîn pere davêjin, pişt re jî mêvan pere davêjin.

Di xêrhatîndayîn û hevdiîtinê de destê hevûdu girtin ne adet e. Dema me pirsas wan dikir tim û tim bersîva wan "Ez gelek razî me" bû û ev yek gelek bi min xweş dihat.

Gurcîstanê; Ramîn Celîdze em di oda xwe de qebûl kirin û piştî nasîna hevûdu wiha got; "Em dostê Kurda ne. Çi ji destê me bê, emê alîkariya Kurda bikin. Miletê Kurd miletekî qedîm û mezin e. Em hêvî dikin ku Kurd xwedî Kurdistaneke serbixwe bin û em bi dewleta xwe cînarê we bin û em wek du dost, du bira bijîn. Wek hûn jî dizanin ku em jî îro jî bo serxwebûna xwe têkoşîn didin. Em îro ne serbixwe ne. Ji ber vê yekê jî kapasîta radyoya me bi sînor e. Lê em serbixwe bin, emê hem radyoya xwe hem jî redaksiyona Kurdî jî pîrr fireh bikin û hewl bidin ku dengê radyoya Kurdî bigihîje derê Gurcîstanê. Ji ber ku me û welatê me gelek belengazî dîtiye, em derdê gel û welatên di belengaziyê de ne, baş fêm dikin. Daxwaz ew e ku hûn jî xwedî dewletek bin".

**"Gurc bi mana mîrxasiyê ye"**

Serokê grûba me Reşo Zilan jî di axaftina xwe de wiha got: "Em miletek jî miletên Kafkasyayê ne. Herçiqas me di dîrokê de rojên şer û aşiyê bi hev re derbas kirine jî, em di rojên rabirdû û ji dîrokê divê ders ji bo rojên dahatû derxin, da biratiya me zexmtir be. Pîrr mixabin em dibihîzin ku hin komar li dijî miletê me tiştên ne însanî dikin. Lê em ji muamela Gurcîstanê kêfxweş in. Em dixwazin ku hûn her tim tiştên ku yên din anîne ser Gurcîstanê bînin bîra xwe daku bi gelê din nekin.

peyvînek kir û di eynî rojê de hat weşandin.

Rojek berê (6.11.1990) dema rêberê me em li Tiflîsê digerrandin, me jineke ku karê paqîjiyê dikir, dît. Serokê grûba me Reşo Zilan got ku ev jinika ha sedî sed Kurd e. Em nêzî wê bûn. Belê, texmîna R. Zilan rast derket. Jinik Kurd bû. Me dest bi sohbetê kir, halê Kurdên li Tiflîsê jê pirsî. Jinika bi emir got: "Ne vaye hûn dibînin. Halê me ne tu hal e. Gurc dixwazin me ji van deran dûr bixin, ji me hez nakin. Karê reş (karê giran) bi piranî Kurd dikin".

**Radyoya Kurdî heftê carekê, 15 daqîqan diweşîne**

Piştî ziyareta serokê Duyemîn ê Radyoya Gurcîstanê me berê xwe da Redaksiyona Kurdî. Di oda redaksiyonê de du-sê afîşên Kurdî, rismê Cîgerxwîn û dolabek hebû. Materyalên wan pîrr kêmbûn. Dema min kovarên Ronahî û Roja Nû pêşkêşî wan kirin, gelekî kêfxweş bûn.

Di redaksiyonê de Keremê Ankosî (berpirsiyar), Bihara Stûrkê û Lamara Salih hene. Beşa Kurdî weşanên xwe di heftê de carekê roja yekşemê, piştî nivro dike. Programa Kurdî 15 daqîqê ye. Di weşanên xwe de agahdarî li ser bûyerên li Gurcîstanê û li ser rewşa Kurdên li Gurcîstanê didin. Di programa wan de lêkolîn li ser çand, dîrok û folklorê Kurdî tîn weşandin.

Redaksiyona Beşa Kurdî di 29'ê Îlona 1978'an de dest bi weşana

xwe kiriye. Ji roja ku dest bi karê xwe kiriye û heya nuha serokê redaksiyonê Keremê Ankosî ye, Bihara Stûrkê li ser xebata redaksiyonê wiha digot: "Di destpêkê de tu tişt di destê me de tunebû. Me her siyan dest bi hînbûna zimanê xwe yê şêrîn kir. Nuha em dikarin bi rehetî hem binivîsîn û hem jî bixwînin. Arşîva me tunebû, lê îro hinek tiştên me hene. Ji roja ku me dest bi karê xwe kir, me dest bi komkirina eser, folklor, stranên Kurdî kir. Her tiştê ku nû derdîçin û dikevin destê me, em pêşkêşî gelê xwe dikin.

Gelê me pîrr ji weşanên me hez dikin û li radyoya Kurdî xwedî derdikevin. Ji me re name dinivîsîn û daxwazên xwe tînin zimên.

Me daxwaz kiriye ku weşanên xwe dirêjtir bikin da em bikaribin di heftê de du roj û 30 daqîqê biweşînin, lê berpirsiyarê Radyoya Gurcîstanê dibêjin ku mecala wan tune ye, selahiyet di destê Moskovayê de ye, roja ku ew mecal dan, emê programa Kurdî jî dirêjtir û firehtir bikin. Di destpêkê de weşana me 10 daqîqê bû, lê piştê kirin 15 daqîqê.

Redaksiyona me ji bo paqîkirina zimanê me jî xebat dike. Em hewl didin ku gotinên biyanî wek Erebi, Tirkî û h.w.d. ji zimanê xwe derxin. Em hewl didin ku gotinên Gurcî nekevin nav zimanê me. Ji bo vê yekê em xebateke tekûz dikin, propoganda dikin, ciwanên xwe teşwîq dikin.

Redaksiyona me diçe nav miletê xwe, ji devê îxtiyaran folklor, stran, metelok û meselokên Kurdî berhev dike û diweşîne. Em urf û adetên xwe jî di weşanên xwe de

pêşkêşî gelê xwe dikin".

**Ziyareta "Şewra Rîsîpiyan"**

Di roja 9.11.1990'an de me Serokê Duyemîn ê Cepha Rustawellî (Kurdên li Tiflîsê jî vê cephe re "Şewra Rîsîpiya" digotin) Georgî Laçêçilozê ziyaret kir. Tiştê ku hat gotin wek gotinên serokê duyemîn ê Radyoya Gurcîstanê bû û pesnê mîrxasî û dostaniya Kurda da. Komela Ronahiyê pesnand û domand; "Komela Ronahiyê herçiqas nû hatiye avakirinê jî di derheq pirsên sosyal û civakî de karûbarên heja kirine û em jê razî ne. Heya nuha tu dijî jî di nav me de demeketiye. Em wisa qebûl dikin ku em dostê hevûdu yê rojên dijwar in, divê em li gel hev bin".

Ezîzê Îsko jî li wir bû. Di axaftina xwe de got: "Me tevde di şewrê de ciyê xwe girtiye û em xebateke baş dikin. Hevkariya Ronahî û şewrê gelek baş e. Me meydan nedaye ku tamsarî di nav me de derkeve. Şewra Rîsîpiya (na rîreşa) hurmetê ji urf û adetên me re dikin û qîmetek baş didin me".

Bi rastî dema min ev gotin guhdarî dikirin dilê min dişewitî û min dizanibû ku peyvên vala ne. Ma "alimên" me yê Ermenîstanê bi şev û roj pesnê Ermeniya û dostaniya wan nedidan? Di dawiyê de Ermenîyan dest bi qirkirina Kurda kirin. A rastî jinika paqîjker digot. Ew kesên ku pesnê miletên din didan, xuya bû ku ji halê xwe gelek razî bûn û haya wan ji Kurdên xizan tunebû.

**Dûmahik di hejmarê bê de**

## Hindik-Rindik

**Tedbîra xwe digre**

Yekî Laz diçe ser tixtor. Piştî muayenê tixtor teşhîsa xwe datîne, dibêje: Tu kanser î?

Kanser kanser, ma wê çer bike... Vedigere gundê xwe. Li gund kî li halê wî dipirse, kî tê ber jê re dibêje "Wele ez AIDS im". Ev gotinên wî dihere digihîje guhê tixtor jî. Tixtor vê yekê pîrr meraq dike, lema jî radibe dişîne pey wî, jê re dibêje:

-Kuro, min jî te re got ku tu kanser î, lê tu diçî ji xelkê re dibêji ez AIDS im. Ev çî mesele ye, jî bo çî tu wiha dibêji?

Mêrikê Laz dibêje:

Tixtor beg, ez tedbîra xwe digrim.

Tixtor fahim nake, dibêje lawo tedbîra çî?

Yê Laz izah dike:

-Çawa be ezê bimirim. Piştî mirina min jî bo ku kes xwe nêzî Fatîma min neke, ez çavê mîlet dîtirsînim!

**Şorba bi qûm**

Li çolên Erebi eskeran jî çawîşê xwe re gotin:

- Em nikarin vê şorbê vexwin qumandar, hundurê wê tje qûm e.

Çawîş hêrs bû:

- Ew çî peyv e? Ma hûn hatin vir xwarinê bicibînin? Em hemû hatin vir ku axa welêt biparêzin.

Ji eskeran yek ket nav peyvê:

- Lê bi vî awayî here axa ku bê parastin wê nemîne. Emê hemû axa welêt bixwin, xelas bikin.

**Esker natirse**

Qumandar ara qedexê kir û li diwêr da nivîsandin ku "araq meriv dikuje". Dotira rojê cumleyek dîn li bin vê cumlê hatibû nivîsîn: "Esker jî mirinê natirse".

Amadekar: Z. Xamo



## DIYARBEKİR Dİ SERNEWE Û TESİRÊ CENGÊ KUWEYTÎ (II)

Hesri ÇIRAN

Eyro ma pêro bêkeyfî. Ez nimajî ez coser ra werîsta, şîya dekewta mînbûsa Berê Koy. Mînbûsi di miştirîyan qalê cengê Kuweytî kerdnî.

Ez Berê Koy di peye bîya, bedenê Diyarbekir ver o ver o heta Fîsqaya (Binê Qeya) ra şîya. Fabriqa Ereçî (Içki Fabrikası) ver di 'erebey Pîranî wardenî, ez şîya weyra se'ta werîştîşê otobusi persaya û mi waştî ki ez bîlet bigîra, bîlet mi dest nêkewt.

Ez ewniyaya ki tretuwarî (qaldirimî) ser o şar paweno. Pawitoxî hîna zav gedey û cenî bî. Barê jîni valiz, livîn û kel-melo bîn o. Heway mi 'ereba jîni zî dest nêkewtîbî cûka pawitînî. Ayanê ki 'ereba tepîştîbî, wenîştîbî, keyfî reydi şîni. Heta ki ez weş ba a menzera mi vîr ra nêşona. Bellî yo ki eyro herkesî tewa ganê xw girota.

Ez ver bi cêr şîya, yew Pîrejmanîjo şinasî raştê mi ame (Pîrejman yew dawa Pîranî ya), mi va:

-Şar rageyreno, ti zî nêşonî cay?

Va: -Ez nêşûna cay, ez key xwi di pawena. De eki merdî, mendî.

Ez Pîrejmanîjî ra aqîtîyaya, şîya dikan ki kekê mi ronîste wo, moralê jey zî herimiyawo. O zî xebitîyêno ki gedanê xwi ray ko key vistewrey xwi. Ma biney vindertî, nêzana çî ra bi, ma yewbînan di weş qalî nêkerd. Ez vana ma zî tesîrê cengê Kuweytî di mendî. Mi xeberî day keye, mi va "Mevindî, bêrî, ma şonî Pîran."

Eyro çiraxê ma zî nêamebi. Rojo Sift xeberî daybî ma, vatbî "Aydın di mêrdimê ma estî, ez şona weyra." (Aydın hetê rojawanê Tirkîya di yew şaristan o). Heqê (ucretê) xwi ma ra waştîbî, ma dabi bide.

Mi ti ra vatbî:

-Demek ti zî rageyrenî?

Vengê xwi nêkerdbî, se ko?

Teştare ra pey lajê mi ame veynda mi da, ma tê rey kewtî şî. Cenîya min û keyna mi zî duraxa mînbûsan di pabey mi bî. Mi jîn ra va ki otobusa beledîya di ca mi dest nêkewto.

Vera vera sexlet hîna zaf bîynî. Cenîyan, gedan, keynekanê resayan, camêrdanê şikitan yanî extiyaran naşt-daştaw pawitînî. Pîzey mi gedan û extiyaran veşa. Îlehîm zî gedan. Xebera jîni çiyekî ra çîna. Werrekê jîni, bar pîlan wenaye wo.

Qiflêwo ki nîzdî ma di bi, qalê Seddamî kerdnî. Yew cenîya extiyari zewtî day pi ro, va:

-Kam sebebê ma bîyo, Hûmay belay jey bido!

Yewna cenî va: -Mela wîrdî kiştî (yanî Amerîka û İraq) pê bêrî, ma zî ino ezîyet ra bixelisî.

Qorî tuf kenî Seddamî. Qalqala Seddamî ya.

Ma şî kiştaw dêsê Lîseyaya Fenî (Fen Lisesi) di pay ra vindertî. Mi vîrî yeno verê verkan inî mektebî rî vatîni Mektebê Mu'alimî yê Diyarbekir (Diyarbakır Öğretmen Okulu), çend serran ra pey bi Lîseyaya Mu'alimî yê Diyarbekir

(Diyarbakır Öğretmen Lisesi), dim a bi Lîseyaya Cumhuriyetî ya Diyarbekir (Diyarbakır Cumhuriyet Lisesi). Inka zî biyo Lîseyaya Fenî. Inka dêsê dor-marê ina lîse newe ra viraştaw, berz kerdo û bîna restore kerda, dûrî ra weş asena.

Tanî mêrdimê şinasî amey ma het ra viyartî şî. Ay hing di keyna mi qirçiriyay, va:

-Ez pay ra betiliyaya.

Cenîya mi tincî (tuncî) ra rûniştî, keyneki anti xwi ver, he-wênay. Lajê mi zî bêkeyfî asaynî. Qayîl bi ki ma gamîna over ray manî, şêrî Pîran.

Nişka ra yew şoforo şinasî mi ver o vejîya. Ino şofor beytarê Fakulta Tibî (Tıp Fakültesi) û Berê Koy di me'aşê bê xwi mînbûsi di şoforey keno. Şoforî va:

-Erebey çinî.

Şar qiflê bi qiflê Berê Koy di vinderto, 'ereba paweno. Yew qiflê nîzdî ma di vinderto, hewt ten î. Ti ra yew camêrd o, yew xort o, ay bîni gedey û cenî yî. Camêrd yewdo qembero weş o. İnî wazenî şêrî Erqenî (Erxenî). Camêrdî mi ra va:

-Ma pi ya yew 'ereba kîra bikî?

Mi va: -E. Ez hadîre ya, hima 'ereba veyni, ma tepîşî.

Yew mînbûsi taday, şoforê ja di bazar kerd, pê nêamey.

Ma ra daşt, bedenê Diyarbekir ver di yew qehwexaney şoforan bi. Cay qehwexanî zaf weş bi. Ez bedenê Diyarbekir ra ewniyaya û bêhemdê xwi tarîxê Kurdan ser o duşunmîş bîya. Tarîxê Kurdanê Merwanîyan (Mervani Kürtleri Tarihi) di nuseno vano seserra yewndesini (11. yüzyıl) di Kurdan Diyarbekir û Farqîn (Silîvan) di se serri hukum kerd. Ino welat destê jîni di bi û ino dewr di Kurdan bedenê Diyarbekir çendna mîtrovî viraşt, berz kerd. Ti ra pey Tirkê Selçûqî (Selçuklu Türkleri) amey, dest inî welatî ser na.

Ay wext o ino wext o bindesteya Kurdan dewam kena. Cengan di xalibi ê qir benî û 'erz û 'eyalê jîni binê payan di şonî. 1925 di Kurdan ramitbi inê Berê Koy ser ki Diyarbekir bigîrî labelê serî nêberdbî. Vanî ay wext kiştaw rojhelatê Diyarbekir ra Kirdanê (Zazanê) Mistan û Botan (Bueton) zaf zor dabi eskerê Tirkan, çî nêmend bi ki dekiwî Diyarbekir zere labelê nêşinabi.

Qederê Kurdan eyro zî xirab o. Hela ma veynî heta key inawa rameno. Qalê deyîra Şivanî mi vîr kiwenî:

"Dewleta Tirk ne ê ma

ya,

A ser gonî û keda ma

ya.....

Mayê, mayê! Bawo,

bawo!

No çî zilm o? No çî derd

o?.....

No welat zey bihlîştî yo!

Heval, heval xelas

keno."

Rojanê bînan ez ki inî rayiran di şîni-ameynî, banî (kasetî) cenîyaynî, lufî cenîyaynî labelê eyro yew bêvengey roniyaya.

Diyarbekir, 14. 1. 1991

do dewam biko

## STOCKHOLM Dİ MÎTINGÊ JENOSÎDÊ HELEBÇE

Mihem HİMBÊLJ

Eyro (16'ê Adara 1991'î) se'et 13 di semedê protestokerdişê jenosîdê Helebçe rê Kungsträdgården ê Stockholm di Kurdî û Swêdî (İsveçli) amey pê ser. Herê, Stockholm di eyam weş bi, tînci akewta bî, kê vatê qay wesar o labelê ma Kurdan rê rojê şîni bi. Çimkî pirto pêrar, yanî 1988 di rojo eyroyin Seddam Huseyinê gonîwerî bombaya jahreñi vistîbî Helebçe ser û weyra panc hezarî Kurdî ameybî kiştîş. Zaliman ne vatbî gede, ne vatbî cenî û kal û kokimî, panc hezar Kurdî nabênê çend deqîqan di kiştîbî. Panc hezarî mêrdim! Ne henek a, Helebçe bîbî Hiroşîma didiyin a dinya. Çi heyf ki ay wext keynê çend organîzasyonanê dinya vişer kes inî jenosîdî ser o zaf nêvindertbî. Cûka Seddamî hîna cesaret girot-bî.

Ez bi xwi se'et 12. 30'di şîya Kungsträdgården. Hi-ma newe davîst ten amebi. Ez dormarê xwi ra ewniyaya, Kurdê ki ameybî, heme bi kîn bî. Ez kê ra ewniyaya, to vatê qay adir ridê cê ra vareno. Heme hêrsbiyaye bî, mirûzê jîni tîrş bi, to vatê qey ramenê keydê Seddamê gonîwerî ser. Jenosîdê Helebçe ki Kurdan vîrî yeno, adir zî ridê jîni ra varo, heqê jîni esto.

Tikêna pey, ez ewniyaya ki şar hêdî hêdî û qiflê bi qiflê ver bi cay mîtingî kirêşiyêno. Deqa bi deqa Kurdî vişî bî. Tek-tuk Swêdî zî mi çiman ver ra kewtî. Se'et ki 13 bi, şar hîna zaf bi. Se'et 13'di serekê Federasyona Komelanê Kurdîstanî ya Swêd di, **Vildan Tanrikulu** şî mîkrofonî ver, bi Kurdî û Swêdkî derheqê jenosîdê Helebçe di qalî (qisey) kerdî. Serekê Federasyoni, peynîya qalanê xwi di va "*Wa bimro Seddamo Faşîst!*", "*Ma Helebçe xwi vîr a nêkerda!*" Goşaritoxan zî pêrinî yew fek ra tekrar kerd:

"*Wa bimro Seddamo Faşîst!*", "*Ma Helebçe xwi vîr a nêkerda!*"

Dim a Serekê Federasyoni anons kerd û temsîlkarê Komîteya Swêdî ya Pawitîşê Heqanê Mêrdimî yê Şarê Kurdî, **Gösta Ekman** şî mîkrofonî ver, dest bi qalanê xwi kerd. Gösta Ekmanî behsê jenosîdê Helebçe kerd û Seddam Huseyîno qatîl la'netkar îlan kerd. Gösta'y va "*Welatê Kurdan bîyo çar parçey, tay Kurdî zî Yewîya Sovyetî (Sovyetler Birliğı) mîyan di estê.*" Dim a behsê muhîmeya paştîgirotîşê Kurdan kerd va "*Kam ki hurmetkarê heq û huqûqê mêrdiman o, ganî (gerek) paştîya şarê Kurdî bitepîşo. Eno yew wezîfeyê mêrdimey o.*"

Gösta Ekmanî dim a, bi name bê Cepheyê Kudîstanê İraqî, **Dr. Mehmed Osmanî** bi İngilîzkî û Kurdî qalî kerd. Dr. Mehmedî va "*Ganî ma de'wa xwi rê wayîr vejî. Ger kê biquwet û xurt bî, herkes qalê kê keno. Gama ki kê pergende û zê'îf bî kes qîmet nêdano kê.*" Dr. Mehmedî dewam kerd, va "*Cengê Kuweytî ra pey Kurdan, 'Erebanê Şîyan û muxalîfanê bînan ê İraqî pi ya ver a*

*hukûmatê İraqî sere hewa nawo, lej zaf giran o. Pêşmergeyanê Kurdan gelek şaristanê Kurdîstanê İraqî girotî. Xeynê Kerkûki, şaristanê binî heme binê kontrolê pêşmergeyan di yê. Kerkûk di zî ceng dewam keno.*" (Çend rojî inî qalanê Dr. Mehmed Osmanî ra pey, radyo û televîzyonanê dinya xeberî day ki Kurdan Kerkûki zî girota. İna ma rê mizgînêka weşî bî.)

Qalîkerdişê Dr. Mehmed Osmanî ki qedîya, Partîya Keskan a Swêdî (Miljö Partiet) ra **Xanima Ragnhild Pohanka** qalî kerd. Ja zî jenosîdê Helebçe ser o vinderti û va "*Seddam Huseyîn him dişmenê mêrdiman o him zî dişmenê tabiatî yo...Ganî kê desta (paştîya) Kurdan bigîrê. Çunkî heway heme kesî azadî heqê tebi'îyê jîni ya zî. Dişmenê Kurdan eyro xurt ê, koyandê jîni vişer dostê jîni çinî. Koyê Kurdan tenê eyro dostê Kurdan ê.*"

Xanima Ragnhild ra pey mes'ulê Kampa Pêşmergeyan a Diyarbekir, **Ekrem Mayî** qalî kerd. Ekrem Mayî derheqê Kurdan di derg û dila înfomasyon da û dim a îzeh kerd ki jenosîdê Helebçe ra pey senîhawa Kurdê Kurdîstanê İraqî remay şî Kurdîstanê Tirkîya. Ekrem Mayî va "*Kurdanê Kurdîstanê Tirkîya ra nêbînî veyşaney ver ma heme merdînî.*"

*Dewleta Tirkîya nêwaştîni ki Kurdê Kurdîstanê Tirkîya ardimê ma bikî."*

Peynî di **Taha Berwarî** qalî kerd. Se'et ki bi didi, ma heme panc bi panc têrêz bî û pi ya ver bi Konsolosxaneyê İraqî şî. Texmînê mi gore ma hinzar ten bînî. Tanîni dest di alaya Kurdan, tanîni dest di zî pankartê bi Swêdkî yan zî Kurdîki nuştay bî. Ma bi vengêdo gurr sloganî vatê.

Ma ki Konsolosxaneyê İraqî ver resay, sloganî hîna pêt amey vatiş. Weyra alaya İraqî amey veşnayîş. Tanî Kurdanê İraqî xwi zêft nêkerd, waşt ki biramê Konsolosxaneyê İraqî ser û jê îşxal kî. Polisê Swêdî dekewtê beyntar, nêverda. Tanî Kurdê İraqî û polisî kewtî tê qirriki, pê ro berrizîyay. Serekê Federasyoni va "*Gelê embazan, wa kes îzin nêdo provakasyonan! Inka ma heme pi ya marşay millî ya Kurdan vanî.*"

Û ma dest pê kerd marşa "Ey Reqîbî" vati. Marşî ki qedîyay ma hemînî pi ya sloganê xwi tekrar kerdî. Serekê Federasyoni da zanayîş, va "*Mîtingê ma ewta qedîyawo, ez şîma ra rica kena îdî hêdî-hêdî vila bî.*"

Ma vila bî, ver bi keyanê xwi şî.

Stockholm, 16. 3. 19

## KEZEBÊ ŞİMA BİVEŞO

Veybûn newî dest pey kerdîb tutî ardîn  
Xelûn newî dest pey kerdîb weşî vetîn  
Hêdî hêdî hin vengî vartîn ûmeyn  
Ma newî kotîn herayî

Yew dem tîfing kiftûn a bi koyûn a gêrên  
Yew dem ranêkotîn vergûn dim a gêrên  
Yew dem çim dişmenî ser ra nêabîrnên  
Ma newî kotîn herayî

Gawûnûn garrûnî xwe çernên  
Şûnûn dewar xwe çernên  
Keynûn newî xwe xemîlnên  
Ma newî kotîn herayî

Ma yobînu ra xelisên, ûmên pê  
Ma dîni yewê bîni oci ra dînûn şey pê  
La kezebê şîma biveşo, rojki nêben ristîpi  
Goya ma newî kotîn herayî.

K. DİRHEM

çernên: çîreynaynî, çîreynaynî

dînûn: dîndan

dîrhem: mehsul, mahsul

gawûn: gawan

kezeb: qeseba, qesiba, qesba, qespa, cigirî

oci ra: owra ra, daştaw, a hetî ra, dota, wata

ranêkotîn: nêrakewtîni, kişt a nêkewtîni

ûmên pê: pê ameynî, aşt bîni, wery ameynî

vara: vere, verî, verek, verek, verek kavir

veyb: veyv, veyve, veyvi, vev, vewe, vewî, vew

weşî vetîn: seridîyaynî, sere daynî

yobînu: yewbînan, yewnan, yownan, yemno, yewmîn,

jewbîna, jewbîni, jûbîni, jûvin, jûmîn, jûbanan, jûmnî,

zewmbîni



# Kurdistan ber bi...

Piştî êrişê bi çekên kîmyayî ya ser Helepçê û herêma Behdîna wek Hişyar Zêbarî jî dibêje; diktatoriya Seddam û gelek kesên din jî bawer dikin ku tevgera li Kurdistanê Iraqê êdî hew dikare piştî xwe rast bike. Lê serkeftinên dawî yên pêşmergan û gelê Kurd jî dost û dijmanan re îspat kir ku tevgera Kurd a milî li Kurdistanê Iraqê neqediya; gava dem bê û şert dest bidin dikare welatê xwe jî bin destên dijman rizgar bike. Çimkî daxwaza mafê netewî û demokratîk ne ya hêzê, ya jî ya partiyekê ye; ew, daxwaza miletekî ye. Loma jî, heta ku Kurd jî wek hemû miletên din qedera xwe bi destên xwe tayîn nekin, ev daxwaz jî wê her jîndar be, tu zor û qewet wê nika-ribe vê daxwaza bi heq bifetisî ne.

## Rewşa dawî

Serkevîna hêzên Kurd êdî jî alî Amerîka û dinyayê ve jî tê qebûl kirin; ku êdî Kurdistan di destê Kurdan de ye. Her çiqas Muhafizên Cumhûriyê bi hêzeke mezin, bi balafir, bi helikopter û bi tanq û topan êrişek mezin birin ser Kerkûkê jî, lê bi ser neketin. Hêzên pêşmergan ew mecbûrî paşdevekişandinê kirin. Li gor beyana nûnerê Cêpha Kurdistanê, roja 25'ê Adarê ordiya Iraqê bi balafir û helikopteran êrişî Kerkûk û Dihokê kirin. Di vê êrişê Iraqê de pêşmergan li nêzî Dihokê balafirek xistin û balafirxaneyek jî xistin destên xwe. Li Kerkûkê şer hîn berdewam e. Nûnerê PDK di beyana xwe de dibêje Muhafizên Cumhûriyê di vê êrişê de 80 tanq bi kar anîn.

## Celal Talabani li Zaxoyê

Celal Talabani di 26'ê Adarê de gihîşt axa rizgarkirî, nav gelê xwe; Zaxo yê. Li Zaxoyê bi hezaran insan çûn pêrgî wî. C. Talabani li wir beyanek da û got, emê hewl bidin ku bi Ereban re li hember Seddam hukûmetekê çêbikin. Her wisa jî dinyayê daxwaz kir ku divê bi gelê Kurd re alîkariya derman û xwarinê bikin.

Di vî warî de Mahmûd Osman dibêje, erê me Kurdistan rizgar kiriye, lê muşkila mezin ew e ku

emê jiyana vî miletî çawa îdare bikin" Ji bo ku em karibin îdare bikin, divê gawek berî gawekê em Seddam ji navê rakin.

Hişyar Zêbarî dibêje: "Serkeftiya Cêpha Kurdistanê di nav xelkê de ye. Kek Mesûd Barzanî û biraderên Yekîtiyê li wir in, Struktureke serkeftiya hêye, komînkasyona wan hêye. Teqriben hemû Kurdistan ji Baasiyan rizgar bûye. Lê divê em hişyar

bin, hazir bin. hîn Seddam temam nebûye, qeweta wî hîn hêye, hêzeke pirr mezin di bin destê wî de ye. Wê heta dawiyê şer bike. Ew ne ji wan kesên wiha ye ku bireve, na, wê heta dawiyê şer bike...

Bi rastî jî bûyerên heta nuha van gotinên H. Zêbarî rast derdixin. Gava rojnama me ket çapê, hîn jî Seddam neketibû, lê hêvî ew e ku gava jî çapê derkeve Seddam ketibe.

## "Mesela Kurdî, mesela..."

Destpêk r. 5

mesela aqaliyetekê yan jî grûbek etnik e. Kurd miletek in ku jî hemû mafên xwe yên milî û demokratîk, jî mafên xwe yên însanî hatine bêparhiştin. Loma jî mesela Kurdî, mesela tayin-kirina qedera miletekî bi destê xwe, mesela bi serbestî bikar-anîna hukûmariya xwe li ser erdê xwe ye. Heta ku negihê çareserkerinek wiha esasî, wê nayê wê manê ku mesela Kurd hatiye çareser kirin. TEVGER, hêzên milî yên Kurd ên din û miletê Kurd jî bo vê armancê têkoşînê didin. Lê em baş dizanin ku ev armanc, wiha bi hêsayî û di demek kurt de wê pêk neyê û demek dirêj bajo.

Ji ber vê rastiyê TEVGER armancên dîrûdirêj ên miletê Kurd û yên acil ên dema nêzik tevî hev nake. TEVGER bêyî ku armancên xwe yên dema dîr û dirêj bide alîkî, jî bo bidestxistina daxwazên acil ên li jêr têkoşînê dide;

-Divê hebûna miletê Kurd bê qebûl kirin, qedexên li ser ziman û kultura Kurdî rabin, di xwendin û hînbûnê de, di radyo, televizyon û warên resmî de, bi kurtî di her warî de zimanê Kurdî divê tam serbest be, çapemeniya Kurdî bi her awayî azad be.

-Divê Qanûna Halê Fewqelade bê rakirin, Walîtiya herêma lex bibe. -Ordî divê ji Kurdistanê vekêşe, êriş, teror û cinayetên ordiyê, yên polis, kontrgerilla û milîsên xwe-firoş bîn rawestandin, kontrgerilla û milîsên gundî bîn lex kirin.

-Gundên ku hatine valakirin,

şewitandin û hilweşandin divê ji nuh ve bîn avakirin, gundiyên Kurdên ku bi darê zorê ji warên xwe hatin derxistin, divê vegezin gundên xwe, cîh û warên xwe, zerara ku ji şewitandin û talankirina, zêvî, rez û baxçê wan gihîştîye wan, divê bê tazmînkirin.

-Divê efûyek giştî bê derxistin, hemû zîndan bîn valakirin, yên ku ji mecbûrî derketine derveyî welêt vegezin welatê xwe, yên ku ji ber baweriyên xwe yên siyasî, yan jî ji ber Kurdbûna xwe jî hemwelatîyê hatine avêtin, divê hemwelatîya wan bê qebûl kirin.

-Ew qanûnên ku azadiya fikrî û rêxistinî qedexe dikin, divê hemû bîn rakirin, garantiya hemû maf û azadiyên demokratîk û mafên însanî bê dayîn.

-Ew karmendên dewletê yên ku qetil kirine, zilm û îşkence li xelkê kirine divê derkevin ber mahkemê û cezayên heq kirine, bistûnin.

-Divê Tirkiye divê hukmên hemû wan peymanên navnetewî ku îmze kirine û yên ku li ser mafên însanî ne, bi cîh bîne.

-Û ya dawî divê pirsê Kurdî di konferansa navnetewî de ya ku jî bo Rojhilata Navîn wê bicive, cîh bigre, Kurd jî wek terefekî di konferansê de beşdar bibin.

Ji bo bidestxistina van daxwazan em bangî hemû kes û dezgehên netewî û navnetewî û rêxistinên mafên însanî, hemû hukûmetan û beşdarên vê konferansa îro dikin ku piştgiriya têkoşîna gelê Kurd bikin.

Sipas

□

# Li qatilê Lorka...

me ên veşartî ji serdema dilîti û hovîtiya pêşin hetanî kuştina Lorka ber bi çav dike. Helbestê zû deng da. Taybetî û biyaniya wê, sivikayî û kûrahiya wê hiştiye ku H. Bedirxan dakeve binê binî, dakeve binê her warî û bi her tiştî re bipeyive, mebest û asteng ew e ku li qatilê Lorka digere:

Min bi evîne bawer kir...  
Pûşkîn  
Lêrmentof,  
û Vircîl  
Ovids  
Danî  
û Milton  
di behîştê windayî de  
û li ser devê dojhê  
û gelyê daryal...  
û Aniyid  
Min bi Evîne bawer kir...  
Zerdeşt  
û Bûda  
û Konfîçyûs  
û İsa  
û Muhemed  
û li qatilê Lorka geryam.

Di vê helbestê de Hamîd Bedirxan mîranî û tirsê bi hev re diafirîne û gunehê kuştina Lorka dixwe hustiyê mirovatîyê. Tiliya xwe bilind dike û bi xwe jî nîşanî xwendevan dike, her tiştî -deq û rû- bi nav dike:

Û tu yê li nik min rûniştîyî  
û bi min re dixwî  
Bohemî  
Sembolî  
Suryalî  
tu qatilê Lorka yî...  
Ez.  
Tu,  
û em...  
Ew tev yên ku li hemberî  
bûyerên rojane dest li pê  
di navê de rawestiyane  
qatil in.  
Şiyar bin ji xewa xwe...  
ji xweşiyên xwe...  
Em naxwazin ku  
Lorka  
û Givara  
û Lomomba  
careke di bimirin.  
Û di vê helbestê de jî. H. Bedirxan dirama ku ji xalekê mirov bi jor keve bi kar tîne û ji xwe re dike palpişt, mîna bizavên mûzîkî ku bi hedan û aram dest pê dikin û hêdî hêdî ber bi jor ve diçin.  
Bi kurtî, H. Bedirxan di helbesta "Li qatilê Lorka digirim" de dixwaze bêje:

Çep û rast di jiyane de hene, lê mirovê ku di navê de dijî, ne dîr e ku bibe sedemê kuştina Lorka. Divê em ji hev nekevin û di bûyerên gerdûnî de gerek em ne temaşevan bin, divê em milên xwe nehejin û nebêjin: ma yê min çiyê?

H. Bedirxan wê bi bejneke şîrî ya mezin serbilind bimîne, digel ku rexingir û rojnâmên Sûryê pîrî caran guh nedane berhem û weşanên wî. Sedem jî ew e ku helbestvanê me Kurd bû û baweriyek mezin bi çîna karker anî bû...

Ev serê çend salan e H. Bedirxan bi nexweşiya dil ketiye û li mal (şikeft) a xwe rûniştîye, peywendiyên xwe bi çarmedor re birine. Eger ne cejna Newrozê be yan jî yekê Gulanê be dengê kenê wî nayê.

Lê belê pirtûka xwe ya duwem bi navê helbestek Cîgerxwîn (Şeva Hicran) berya du salan weşandiye û piştî sê rojan li pirtûkxanên Sûryê hew peyda bûye... Bê guman wê H. Bedirxan herdem helbestvanekî mezin be. Wê evîndarekî mezintir be.

Bo zarokên gundê xwe:  
Ez ji zarokên cihanê  
ji tevan hez dikim.  
Lê belê bêtir ji zarokên  
gundê xwe.

Û... anha dilekî nexweş li gundekî bi navê şiyê "Şêx El Hedîd" li Çiyayê Kurd heye. Di bîden-giyê de dijî, êvarê bi tenha xwe dipûnîje û li salên dîr, li peyven xweşik temaşê dike, bi şînî distirê û ji bîr nake ku rojek hebû û bi dilxortî beşdarî cejna buharê dibû:

De em di vê rojê de  
şahiya xwe bikin bi cejna buharê.

Li ser gîhayê kesk  
Li ser serê çiyân  
di gundan de, di bajarên de  
û di kargehan de...  
Digel bê me' diya cihanê  
Va ez qevdek gulên  
boyaxbûyî bi xwîna kesk  
bi rokê... diyarî te dikim.

Silav bo mirovê mezin, beriya ku helbestvanekî mezin be... Hamîd Bedirxan.

A nuha tu hêdî hêdî bi serbilindî dimrî, bi neguhdanek mezin li gundekî ji gundên Asya, yan jî gundên Kurdistanê xweşik...


## Mehmet Altan wefat kir

Mehmet Altan ji ber nexweşiya xwe ya qanserê di 26'ê Adara 1991'î de, li Swêdê, li bajarê Norrköpingê wefat kir. Ew di sala 1960'î de li navçeya Mêrdînê, li gundê Talatê hatibû dinê û ji sala 1977'an û vir de di nav hêza KUK'ê de cî girtibû.

M. Altan ji ber xebata xwe ya siyasî di sala 1983' an de ji welat derket û di 1985' an de li Swêdê bi cî bû. Ew li Swêdê jî di nava xebata Federasyonê de aktîf xebitî.


Mehmet Altan zewicî bû û babê 4 zarokan bû.

Em sersaxî ji malbat û hevalên wî re dixwazin.




Mehmet Altan

## Di 13 saliya bîranîna wî de



Hamit Akil  
1953 - 16. 03. 1978

## Di 5 saliya bîranîna wî de



Eyyub Kemal Adsiz  
1957 - 20. 03. 1986

Hûn!  
Bayê ber tavê.  
Bajarên ku xwe li ba  
dikin..  
Sînoren ku goristanan  
li hev par dikin..  
Stêr ku xwe bi ser  
kenê te de xwar  
dikin..  
Hûn û buhar,  
Ku guregurê di hêlîna  
êvîne de şiyar  
dikin

Hevalên wan ên  
Partiya Pêşeng



Di salên 1960'î de rêçek ji Helebê ber bi Şamê ve dihat kişandin, rêçek nû bû, ji qahrê, xwêdanê û westana mirovên ku salan û pikolîyê û perîşaniyê ew piştixûz kiribûn... çend zîlamên bejindar tevîrên xwe û axînen xwe li ser wê rêçê hildidan. Dema ku bîna xwe berdîdan, xwêdana eniyên xwe bi zendikên şîlbûyî - bi xwêdana germ- paqij dikirin. Dema ku xwarin dixwarin û av ji tenekên zingarî vedixwarin... wê gavê, mirovekî çil salî bi ebrîwên yekser û porekî tof fêr dibû ku wê çawa dengê kenê xwe bilind bike, wê çawa bi awakî ciwantir bîna bîra xwe:

*Em wekî ronahiyê bûn...*

*Wekî avan bûn*

*Wekî tava rokê li ser çem...*

Mirovekî bi şewat çixare dikşand û çend zîman bi kar tanî. Zîmanê Nazîm Hikmet û yê Aragon û yê Se'dî Şîrazî û zîmanê Mûtenebî û Adonîs û bi wan re jî zîmanê xwe yê zîmkakî, yê Siyamend û Xecê, yê Herîrî, yê Cizîrî û Xanî. Zîmanê ku ji agîrekî pîroz ji xetîra Mîdyâ afîriye.

Ew mirov bejindar bû... helbestvan bû... Hemîd Bedirxan bû.

Wê çaxê helbesta Erebî li Sûriyê qonaxeke nû derbas dikir, zîman û formeke nûjen peyda bûbû, an helbesta "lêvane" dihat damezirandin û Hemîd Bedirxan dibe yek ji nûnerên wê helbestê. Ji yana xwe û bîranînen xwe, gundê xwe "Şiye" yê di nav darên Zeytûn û stîranên Kurdî yê kevînar de û dawî "şikefta xwe" a ku mala wî ye, dirîjîne ser bergan û pêşkê-

lavbûyî di sînorên xewna şikestî de ji Efrîn û Reco, ji Hac Xelîl û şiyê gemya hewarê û bedbextiyê derbas dibe û digihîje tîrba Reşîdê Kurd li Amûda tozîn. Pêşkên dema dilsot dihingivin kêlan û sibehên hêviyê ji mijankên gel tene dawşandin, ji zendên karke-rên Rojhilata Navîn derbas dibin, pelû dibe û dikulkule û di gurçîka Qamişlokê de li ber serê Cîger-xwîn şîrudê azadiyê xwe li ba dike. Û H. Bedirxan buhara çar-medor dimije, bi serê pênûsê hêviyê û evîne û dilşadiyê serûkaş dike. H. Bedirxan helbestvanê hiş û bîr, koç û kolana ye, di helbestên xwe de dîroka însan bi tevayî radixîne û nemaze beşê ku bi xwîna karkeran û gelên bîndest hatiye neqîşandin li mirovekî giştî û nemir li tîkveçûn û şîniyên mezin digere. Û heger yek-caran H. Bedirxan di helbestê de guh nedaye hunermendî û avahiya stafîkî sedemên vê yekê naveroka giştî ye, yan jî di vê cîhana zordest û mîrkuj de lêgera li wekhevîyê ye. Di helbestên wî de sîmbol cîh li hev teng dikin. Dîroka kevînar û nûjen serî hil dide bêyî listikên şîrî û çiv li tev hêviya zîmanî ku gelek helbestvan ketine xefkên wê. Helbestvanekî bîrtuj e, deng zelal e û helbestên wî herdem miştûbûyîne bi bîreweriyê û bi hişyariyê, giyanê xwe û nivîsa xwe ji hev cuda nekiriye... gelek caran li ser des-mal û piçikê kaxezan nivîsiye. Hevalên wî paşê dane hev û bi navê "Li Ser Rêçên Asya" pirtûka wî ya yekem tê weşandin. Û bi vê pirtûkê asoya helbesta xweşik

## Hemîd Bedirxan Li qatîlê Lorka digirim

Mihemed Eflî Huseynî

Ehmed Huseynî

Şî xwendevanên helbesta nûjen dike.

Ji destpêkê helbestên wî bi rengê dilpakî û perîşaniya Kurdan xemilandî ne. Û bîna du helbestvanên mezin û nemir ji wan têt. Nazîm Hikmetê ku H. Bedirxan di girtîxanên Tirkiyê de pê re maye û naskiriye... û Cîgerxwîne ku ji mêj ve peywendiyên wî bi H. Bedirxan re li ser pîrozbahîya helbestê ava bûbûn. Û bi dû dîwana "Kîme Ez" a seydayê Cîgerxwîn re, H. Bedirxan helbestekê bi navê "Kîme Ez" diweşîne û pirtûka xwe ya duwem navê helbesta Cîgerxwîn "Şeva Hicran" lê dike.

*Ez im ew dilopa ku  
şaxên zeytûn û hîrmîyê  
av dide*

*Xetîre me di çîrên hejaran de  
sîmbêlekî kesk im.*

Lê belê dengê H. Bedirxan ê xisûsî her û her dide xuyakirin ku jiyane tîra xwe ew sîraye, ew afirandîye ta ku helbestê di hemû quncikên heyîna xwe de, di hemû tiştî de, bijî: çayxana Qesir li Helebê, taxa Suryanî ya kevînar. Xwendevanên Unîversîta Helebê ku helbestên wî ji desthev dirvînin, bîranîna û piyala meyê ya ku di derengiya şevê de di meyxaneyek biçûk û gelêrî de nêzikî peyvên lerzok dibû û êşa gel ku dibû xwîn, destan û serpêhatî û çîrokên dayik û pîrikan, dengê sazbandan û axîna bajarên be-

û çeleng dide diyarkirin. Tîn û evîna xwe ji bo mirov, ji bo şoreşgêran dike diyarî û dibêje: wê pêşerojê bi kêfxweşiyek mezin di ser dev re biçê. Pêşeroja mirovên şoreşger ên ku H. Bedirxan bi xwe yek ji wan e, beşek ji jiyana xwe û çend salên giranbûha di girtîxanan de, di bêkesiyê de û di perîşanî û hejariyê de qedandiye. Her gav bi Spartakus, Lorka û hevalê xwe Aragon re diqêre û dinale: -Gerek însan bi hawakî bê sînor azadbûyî be, bi nan û dad be, hetanî ku bikaribe giyana xwe, daxwazên xwe pêk bîne, giyana ku di vê serdema însanxur de ya ku xwîna mirovan mîna avê dimije, têt kuştin.

Li jêr esmanê Asya, herêma ku dagirtiye bi tarî, belengazî û nezaniyê. Bang dike, bangî pêxemberê berbangê dike. Bangî simbelekê nûrengîn dike:

*Li jêr esmanê Asya şiyar  
rêçên me dirêj dibûn  
de em serdana xwe berdewam  
bikin  
de baweriya xwe ji bo sibhê  
veşêre  
çirîska dîlîtiyê a ji nişkê de  
me ji ser rê nabe...*

Sala 1982'an de H. Bedirxan helbesta "Li qatîlê Lorka digirim" weşand û pê bû piştgirê însan û heyîne bi hawakî bêhempa, derdên

Dûmahîk: r. 11

# Ferhengê Lîteratûrî

Amadekar Bavê Nazê

## Komediya

Komediya ji bêjeya Yûnanî; Comoidia hatiye. Comos bi mana hofka kêfxweşiyê û oide bi mana stîranê ye.

Komediya rengê ji rengên û bîngêhîn yê dramê ye. Û koloziya (lihevxiştin, dijîf) bûyer û kerekterê bi hawayê pêkenîne derbas dibe. Henek û qerf (wek du aliyên ken) di komediya de dibin wesîle û bi alikariya wan, kûrbûn û dijîtiya di jiyana merovan û civakê de belû dibin. Lêbelê piyasa komedî, pêwîst e xwe dûrî bîstikên mûanata (dilêşiyê) bike. Heger ev element têt de peyda bibin, êdî ewê ji komediya derbasî dramê bibe.

Lehengên komedî, bi meqamên xwe, kêmi kesên hawîrdora xwe ne. Bi xwe jî vê yekê kariator (wek form û wesîle) dibe rengvedan ji tabî wan yê komedî.

Komediya bi naveroka xwe, ne tenê bêmirziyê di civakê de xwiya dike, her wiha jî bi riya pêkenîne, bêyî ku kesî biêşîne, xelkê dikenîne û wan kêfxweş dike.

Bi xwe, ken di komediyê de bi awakî dayimî, bi lehengan re ye. Ken fena ku di komediyê de dibe lehengekî nedîtî û li ser sehnê diçe û têt.

Komediya, di dîroka xwe de, xwedî du itîcahan bû; bi riya henekan û ya qerfan. Ya pêşî sivik e û ya dawî dijwar û giran e.

Bi xwe, komediya bi du tiştan jî hev cuda ye; bi kerekterên

lehangên û jêderên bûyaran. Di haletê pêşî de, mesderê pêkenîne kerekter bi xwe ne (cewher û cîhana giyana wan e). Di haletê duyem de, mesderê pêkenîne ji navka bûyerê bi xwe der têt. Helbet hin piyês hene ku her du haletan di xwe de dicivînin û ev çêtîrîn piyêsên komedî ne.

## Ken

Ken bi tebîetê xwe demokrasiyê ye. Ew ji bo rexne û xwiyakirina kêmasiyan, xwedî hêzek mezin e. Ken ji bo şerê nexweşiyên civakî çekê kîrhatî (aktîv) ye. Bi riya ken, tac dipenqizin, diwêr hildîweşin û sistem diherifin.

Li gora tebîeta objekt û súbjektê, du numûnê hene; qerf (satîr) û henek (humor).

Qerf bêyî kompromîs, fezha her tiştê ku ne li gora idiyalên pêşketine ne, dike. Ew li ser vî riyê, her tiştê ku jê re dibe asteng, li ber xwe dibe.

Bêjeya qerf bi latîni jê rê, dibêjin satîr. Ew gotin bi mana xwe ya herfî ken e. Li gora teoriya lîteratûrî, qerf rengê ji yê lîrikê ye. Bi riya helbestên devavêtîne (suxriyet, hîcîw) rexne li diyardeyên civakî yê negatîv dihatin kirin. Lê di qonaxa Vejandinê de (qerfên Servantus), çerçewa qerfan firehtir dibe û panorama jiyane bi alikariya prozê (nesîrê) dide ber xwe. Hîn Hegil di heyama xwe de, nivîsibû ku; merov bi dijwarî dikare qerfan bide nasîn û bike celebek ji yê

edebê. Ew dinivîse çilo qerf ne li gor êposê ye, wiha jî ew ji lîrikê nayê hijmartin.

Lê ji ber ku nêrina nivîskarê berhemê qerfayê, neveşartiyê û ew bi rola mûtehem radibe, dihêle ku ev celebê ha ji yê edeb, nêzikî êposê be bêtir ku ew nêzikî lîrikê be.

## Henek

Henek (humor) bi rexnen xwe ji qerfan siviktir e. Ew di mada (objektê) xwe de, ne her tiştî dijî idiyalên xwe dibîne. Ji ber vî yekê, ew dikare, çavên xwe li ber hin tiştan bigre. Lê nayê wê manê ku henek li hemberî kêmasiyan bê diran e.

Bi xwe henek ji nelihevhatina form û naverokê çê dibe. Wek nelihevhatina qelafetê mezin û serê piçûk e. Henek bêyî ku kesekî bi taybetî bi nav bike, lê bi gotinên bi hukmet û pêkenînen sivik dikare bighê armanca xwe. Di vir de bikaranîna, gotinên di ciyê xwe de û yê ji nişkave rê li ber merovê hember tene girtin.

Ev diyalog wek nimûne;

- Ma ne bes e, kes nemaye, ku te ji wan nedizîye?

- Ma destê min di bêrika xwe de dîtiye?

Di vî teksta piçûk de, li gel ku merovê dijî tuhma dizîtiyê ji ser xwe raneke, lê bi aqiliyek henekî rê li ber tuhmê digre.

## ne karê aqîla ye lê rast e

### Amadekar: Hesen Mizgîn

Li gor lêkolîna ekonom Dennis Miller li Unîversîta Baldwin-Wallace li Ohîoyê (DYA) kesên bejînkîn ji kesên bejîndîrêj du qat zêdetir dijîn.

**Niha zebat têt kirin ku teyareyek nû ku wê bikaribe 25 car jî deng zûtir biçê. Teyare wê him motora xwe ya jet û him jî ya roketê hebin.**

Xuyaye gelê Britanya Mezin pîrr dikuxun. Di salekê de 75 milyon şûşe dermanê kuxikê têt firotin.

**Japonî robotek bi çar teker û milekî çêkirine. Ev robota ha li dinê cara yekemîn di çinîna kirina porteqalan de têt bikaranîn.**

Însan di rojekê de nêzî 50-100 mûyên porê xwe diweşîne. Şansê me heye ku di ciyê wan de mûyê nû derdikevin.

**Di zîmanê Navayo ku ji alî Sorînen li Bakura Amerîkayê têt axaftin de tu gotinên çêr (sikêf) tune ne.**

Hêşînayîyek an jî giyayek, bi tevî hêşînayî yan jî giyayekî din zûtir digihîje û berê xwe dide rojê. Hêşînayîyên ku tevde digihîjin, li ser tîrêjên rojê rekabetê dikin. Hêşînayîya ku di bin siya yê din de dimîne, enerjîyeke mezin serf dike ku ji siyê xelas bibe.

**Li dinê marmarokên herî mezin li Endonezyayê ne. Nêrên wan dikarin heya 3 metre dirêj û 166 kg giran bin.**

Lêkolînerên Amerîkî bi teknîkeke nû dikarin marmarok an jî gumgumokan piçûk bikin. Lêkolîner jî hêkên marmarokan hinek zerika hêkê bi aleteke taybetî dimijin. Ji hêkê ku zerika xwe hindik e, marmarok an jî gumgumokên piçûk çêdibin.

**Li dinê kanala herî dirêj ku di navbera payîtexta Pekîne û Hongzikuyê ye - Kanala Împaratoriyê - 7 km din hat dirêjkirin û bû 1801 km.**

Li Ewropayê mirovek di rojekê de navbera 500 û 800 litre av xerc dike.